

Ziman U Zar

salî çwarem_ jmare (19) (rezberî_ 2725) (payîzî_ 2025)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Xudan îmtiyaz:

Dr. Teha Resûl

Sernivîser:

Fereydûn Saman

Sernivîserê fexrî:

tofîq wehbî beg

Desteya şîretgerî:

d.wirya omer emîn

d,hogir mehmûd

d.mizgim çali

d.bêstûn hesen ehmed

kameran rehimî

Rawêjkara kargêrî:

Evîn ehmed

Rawêjkarî Yasayî:

Salim Selman Kûbeçî

Ziman **U** Zar

salî çwarem_ jmare (19) (rezberî_ 2725) (payîzî_ 2025)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Serrastker: seheyb farûq

dîzayn: umêd mihemed

çap: 2025

tîraj: 500 dane

nirx: 5000 dînar

çap: çapxaney panda



le blawkrawekanî damezrawey kerîmî eleke

be sponserî darayî berêz

dktor (teha resûl) çap krawe

ji bo peywendî bi kovara ziman u zarî:

fereydunsaman61@gmail.com

00964 750 448 0493

Ziman û Ferhengnivîsî ya Kurdî:

■ Muhemed uncu

•Pirensîbên nivîsandin û amadekirina ferhengê çi ne?

Berî ku min, dest bi bersivandina pirsên kovara “Zaman û Zar” nekiriye, divê ez nasînekê ji bo ferhengê bikim, ka ferheng çi ye, paşê jî di derbarê armanca ferhengê de çend gotinan bibêjim. Li gorî min ferheng çavkaniya serlêdanê ya sereke ye. Ew çavkaniyên wîsane ku, wateya peyv, kok û binyata wan, bilêvkirina wan, pêwîrên wan ên di nav zimên de bi awayekî rêk û pêk şirove dikin û bi me dide nasîn. Armanca ferhengê, hilaîna bin qeydan û belgekirina pêyv û bêjeyên di zimanekî de heyî ku ew di heman demê de heyîna wî zimanîne. Ne ji bo pêyv û bêjeyan tenê, ji bo term û têgîh, biwêj û îdyom, pend û gotinên pêşyan jî wîsa ye.

Weke tê zanin gelek rêzik, rêbaz û prensîbên ferheng nivîsandinê hene. Şertê ferheng nivîsandin û amadekirinê yê pêşî, mişkûlpeşandî (tîtîzî), zimanzanîn û xebateke birêk û pêk e. Prensîbên ferhengnivîsandinê yê bingehîn, li gorî min divê weke ên li jêr bin.

1.Kes yan koma dikê ferhengê binivîs yan amade bike, divê di karê xwe de pirspor be, zimanzan û hêla jêrîn di derbarî pêyv, têgîh, biwêj û gotinên pêşyan di wî zimanî û zimanên di wê malbatê de (Ji bo Kurdî, koma zimanên îranî û hîndawrûpî de) arestebe.

2.Kes yan koma ferhengsaziyê, eger dixweze li ser ferhengeke Kurdî xebatê bike, divê ew di hemû zarava (kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn/ soranî, zazakî/ dimilî, lekî, goranî, loranî, hewremanî û hwd) û devokên (botî, behdînanî, rojavayê ferêt, serhed û hwd) ku di Kurdî de hene bigêjin.

3.Divê kes yan koma ferhengsaziyê hemû çavkaniyên dikê sûtê jê wergire amade bike û dayne bin destê xwe. (Ferhengên berê hatî nivîsîn, ji bo Kurdî ferhengên pehlewî, farisî, yê zimanên îranî û hîndawrûpî, ferhengên herêmî û yê ji layê kesên amator ve li qadê hatî tomarkirin û hwd)

4.Eger ferhengsz dixwezin ji bo kurdî ferhengeke term û têngîhan binivîse, ji bo term û têngîhên ku di kurdî de berê tune ye, li navekî bigere, divê pêşî li hemû zarava û devokên kurdî binêre, eger ku di zarava û devokan de tunebe, hîngê berê xwe bide zimanên îranî û paşê li ên hîndawrûpî binihêre.

5.Divê nivîskar yan koma nivîskaran pêşî armanca nivîsandina ferhenga xwe zelal bike, çima, bo çî û ferhengeke çawa binivîse? Ferhenga dixweze bê binivîsandin ferhenga pêyvane, ferhengeke etîmolojiyê ye, ferhenga term û têngîhane, ferhenga biwêjane ne ya gotinên pêşyan û hwd?

6.Kom û girseya ku mirov dikê ji bo wan binivîse zelal bike. Yanê ew ferhenga dikê ji bo kê bête nivîsîn, yan amadekirin. Ferhenga me wê xîtabî kê bike, berve dêrên wê zarokan, kesên têngîhêstî ne, kesên dixwezin hînî zimên bibin, kesên dixwezin bigihêjin wateya peyv û bêjeyan, kesên dixwezin hînî kok û binyata pêvyan (etîmolojî) bibin, ne kesên endamê akademiyê ne?

7.Divê meriv cureyê ferhenga xwe diyar û zelal bike, bîngeha xebatên xwe li gorî wê daye. Yanê ferhenga mirov dikê amade bike yan binivîse ferhengeke yek zimanî (Kurdî û Kurdî) ye? Ferhengeke du zimanî (Kurdî û Tirkî, Kurdî û Erebî ne Kurdî û Farisî ye) ye? Yan jî ferhengeke pîrzimanî ye.

8.Ferhenga dikê bê amadekirin, ferhengeke xwedî mijare (tema) weke: Ferhenga hiqûqî, mîzuqî, aborî ye, ferhenga biwêjane ne Ferhenga gotinên pêşiyane, yan xwedî wateyeke din e?

•Nivîsandina ferhengê heta çî radeyê xizmeta zimanê yekgirtî yê Kurdî dike?

Bêguman pîrsa zimanekî yekgirtî û nivîsandina ferhengan du pîrsên ji hev cûdane. Ger ku mirov li ser peyvendiya van herdu mijaran raweste, divê berî hertiştî bête zanîn ku zimanekî yekgirtî di heman demê de şertê netewbûnê ye. Şik û guman li ser nîne ku zimanê yekgirtî ji bo netewekê

pêwîste û divê di vê mijarê de astengiyên li ber riya zimanê yekgirtî yek û yek bêtin paqaqij kirin. Zimanê yekgirtî ji alî gramer û raştîvîsê de xwedî rêzik û rêbaze, lew ku mirov ji zimanê bê rêrêzik û rêbaz sûdê wernagire û jê re jî naçe sêrî. Tevî pê re neçûna sêrî têgihêştin û xebitandina wî zimanî jî zor zehmete. Ger ku em bîr ser peyvendiya zimanê yekgirtî û ferhengan divê pêşî em têbigihêjin ku ziman bê termînoloji û ferheng nabin, lew ku di her zimanekî de ferheng û termînolojiyên weke behrevanî, zanişt, felsefe, hiqûq, wêje, çandin û hilanîn, baxçevanî û hîn gelekên din hene. Eger zimanên netewan ên yekgirtî têra nivîsandina van termînolojiyan neke jî, zimanzan û filologên wî zimanî van ferheng û termînolojiyan ji zimanên biyanî pêyda dikin. Weke ku Tirkan termînolojiya behrevaniyê ji rûmkî, ya huquqê ji erebî, ya wêjeyê ji kurdî û farisî, ya çandin, hilanîn û baxçevaniyê tevahî ji kurdî standine. Yanê di zimanekî de pîrbûna ferheng û termînolojiyan wî zimanî dewlemend dike, nêzî zimanê zaniştê dike û di domaniya demê de wî zimanî di qada navnetewî de, di nav binemalên zimanan de dike xwedî cihekî bi rûmet. Pîrbûna peyv û têgihên zimanekî zirarê nade yekgirtîbûna wî, zimên dewlemend dike zimanê zaniştê,

•Peyiv û Termên herêmî ji bo zimanekî standard ê Kurdî çiqas bikêr in?

Ji bo zimanê standartkirî, peyv û termên herêmî ne astengî, li dijî vê yekê ji bo estetîk, bedewkarî û vegotîneke şebap, dewlemendiyeke bê hempa ye. Zimanê standartkirî ne zimanekî dorpêçkirî û teng e, li dijî vê yekê zimanê ku bi peyv û bêjeyên pir xenî bûyî ye. Lewma jî ne nivîsandina ferhengên peyv û bêjeyên herêmî, gunehkariyeke zor mezine, lew ku îhtîşam û debdebeya zimanan di peyv û bêjeyên herêmî ên ku di heman demê de giyana folklorê wî gelê de raza ye. Zimanê yekgirtî van peyv û bêjeyan digre, kirasê raştîvîsê lêdike û wan dêxe nav gencîneya pêyvên ku di zimên de hene. Roman yan pexşanên dirêj hene ku bi panzdeh hezar pêyvyan hatine nivîsandin. Dîsa romanên ku bi çend hezar peyvyan

hatî nivîsandin hene, ez ciyawaziya çêja wêjeyî ji xûnerên vê nivîsê re berdidim. Çima ku pexşanên bi zimanên jar û aloz hatî nivîsîn, tameke wêjeyî nahêwirînin û mirov naxweze wan bixwîne.

•Ew kesên ku ferhengên biyanî werdigerînin an jî amade dikin bo Kurdî çiqas xizmeta zimanê Kurdî dikin?

Ew kar hêla jêrin, solixa zimanê kurdî fireh dikin û ji alî vegotinê de zimanê me dewlemendtir dike. Bêguman fêydeya wergerandina ferhengên biyanî bi vê yekê ve ne sînordar e, zimanê kurdî dikin xwedî bêje û têgîhên nû.

•Zimanê Kurdî heta çi radeyê ji ferhengêk berfireh ji bo hemî zarên Kurdî sûd wergirtiye?

Bêguman fêydeya ferhengên berfireh, ji bo zimanê kurdî nayê pîvan, bi hêjmarê nagihe dawiya faydeya wê, lew ku faydeyên wê ewqes pir in. Di nivîsê de ferhengên berfireh, pêşî li nivîskarên kurd vedike, wan digîhîne lûtkeya vegotinê. Aştengiyên nivîsandinê li holê radike û tameke xweş tevli nivîsa nivîskar dike.

•Ferhengên Kurdî û zimanê Kurdî heta çi radeyê ji ferhengên zaniştî û hiqûqî sûd wergirtiye?

Bêguman ew bi jêhatina nivîskar yan amadekarê ferhengê ve girêdayî ye. Ji xwe çavkaniyên peyv, bêje û termên hûquqî û zaniştî, ji xwe huquq û zanişt e. Nivîskarên ferhengê çiqas ehl û pirsporê karê xwe bin, ewqes fayde ji wan çavkaniyan werdigrin.

•Rasparde û pêşniyarên we ji bo nivîsandina ferhengêk berfireh ji bo zimanê Kurdî çi ne?

1.Berî hertiştî divê kesê dikê ji bo zimanê kurdî ferhengêk berfireh binivîse hemû ferengên devok (botî, behdînanî, rojavayê ferêt, êl û hozên

ji hev cûda) herêm (her şar û deverekê) û zaravayên (zazakî/ dimilî, soranî, goranî, hewremanî, feylî, lekî û hwd) Kurdî peyda bike û jê sûdê wergire.

2. Pêyvên hemwate û ku li gorî herêm û deveran diguherin (weke peyv, şor, bêje, kelîme heman watene, weke ku axaftin, şorkirin, xisekirin, şitexlîn, xeberdan û peyîvîn tên heman wateyê) di ferhengê de bêtin nivîsîn, eger di navbêna wan de ciyawaziyên biçûk jî hebin bête diyarkirin.

3. Cureyên peyvan bêtin diyarkirin weke ew peyv nave, serenave, komenave, kirde ye, hokere, cînave, lêkere, rengdêre yan tişteki din e.

4. Zayenda peyvan sedî sed bête nivîsîn, taybetî ji bo zaravayên kurmançiya jorin û zazakî bête diyarkirin, weke peyv nê ye, mê ye, yan notar e.

5. Ger hebe wateya peyvan ya mecaz bête nivîsandin.

6. Piştî danasîn û şiroveya pêyvê, divê peyv bi mînakekê di nava hevokê de bi awayekî rast bête bikaranîn.

7. Ger ferheng ya etîmolojiyê be, binyata wê û çavkaniya wê bête nîşandan (peyv bi kîjan zimanî ye, di kîjan zimanî de yan di ser kîjan zimanî re ketiye kurdî)

8. Çawaniya pêyvê bête nivîsandin (weke peyv resene, hevdudaniye yan çêkirî ye. mînak sol, peyveke resene, lê belê pîlav peyveke çêkiriye)

9. Pêyvên hemdeng bête diyarkirin (weke peyva ‘ta’ dema bi ‘t’ya serê zimên bête bilêv kirin dibe dezî, dema bi ‘t’ ya dijwar bête bilêv kirin dibe curenexweşiyeke bi ataş) di kurmançî de ew peyv di heman demê de tê wateya, balya (ji du aliyên bêr(bar) her aliyek ‘ta’yek e) jî.

10. Divê li ser tewanga pêyvan bête rawestandin, mînak peyva şivan dema ditewe dibe şivên, dema peyva dinya ditewe kurt dibe dibe dinê hwd.

11. Hinek peyv di kurdî de bi hev ve dikeli jin. Weke ku ji wê dibe jê, li wê dibe lê, ji xeynî wê dikeli je dibe jexne yan jexnî û hwd.

Piştî bersivandina van pirsan, ez dixwezim bi çend hevokan behsa

xebatên xwe ên ferheng nivîsîn yan ferheng amadekirinê bikim.

Xebatên min ên li ser ferhengan bi awayekî amator, xebatên li qadêne. Yanê min di xebatên xwe ên ferhengnivîsiyê de zêdetir kar li ser peyv û gotinên ku min bixwe bi riya hevdîtî û hevpeyvînan ji devê çavkanî û jêderkan tomar kirîne. Lew ku min demeke dirêj (bi qesî 40 salan) berhevkariya folklor û zargotina gelê xwe (Kurdan) kirî ye.

Pêşî min ferhenga devoka herêma xwe (Ez xelkê bajarê Semsûrê me, Semsûr li bakurê Kurdistânê, rojavayê Çemê Ferêt cih digre û bajarekî gelheya wê sedî nod û heşt Kurde) nivîsandiye. Di vê ferhengê de min bêzî 9000 peyv û bêjeyên herêma xwe dane nasîn. Ferhenga min bi kurdî ye, peyvên di vê ferhengê de cih digrin jî bi Kurdî hatine şirove kirin. Min di vê ferhengê de cûre (nave, navê taybete, lêkere, rengdêre, cînave, hokere, baneşîne û hwd) û zayenda (peyv nê ye yan mêye, yan notar e) her peyvê li ber nivîsandiye, paşê jî şiroveya peyvê kiriye û ew peyv min di nav hevokê di bikaraniye.

Pişt re min ferhengeke biwêjan (îdyom) nivîsandiye, ew berehem ji du bergan û ji 16 000 biwêjên di zimanê kurdî de heyî pêk tê, ferhenga min ya biwêjan du bergin. Min hemû biwêjên di ferhenga xwe de li qadê berhevkirine û ew bi dirêjîya 40 salan kirine ser hev. Biwêjên di vê ferhengê de hemû li gor rêza abc yê cih digrin û min ew yek û yek şirove kirine ku heye min çîrokên wan jî li bin nivîsandine. Şiroveyên min di derbarê wan de kirî, li gor nêrîn û vegotinên çavkaniyan pêkhatine. Di dema tomarkirinê de min ji wan pirsîye, hûn vê biwêjê çawa bikar tînin û wateya wê çi ye? Wan jî di vê mijarê de fikrên xwe ji min re gotine, min jî ew bi wê sûd wergirtinê şirove kirine.

Ji bilî van herdu ferhengan, eger ez gelek ferhengên ku min amade kirî ên biçûk nekim hesêb, min ferhengeke gotinên pêşîyan nivîsandiye. Ew ferheng, varyantên wan ne tê de, nêzî 50 000 gotinên pêşîyan ên ku min piraniya wan li qadê, bi riya hevdîtî û hevpeyvînan ji devê jêderkan tomarkirî nivîsandiye. Ew berhem ji 4 bergan pêktê, her bergeke wê nêzî

1250 rûpele, tevahiya wê 5 000 rûpele. Min ew gotin li gorî 235 mijaran dabeş kirine (weke, ên li ser aboriyê, ên li ser jinan, ên li ser hevaliyê, dostiyê û hwd.) Her beşek di nava xwe de li gor rêza abc hatiye nivîsandin, her gotinekê varyantên wan li bin hatine nivîsandin, min ew gotin kit û kit şirove kirine û ku heye min çîrokên wan jî li bin nivîsandine.

Yanê bi kurt û kurmancî ferhengnivîsiya min, zêdetir li ser zargotinê ye. ya rast ez ne ferhengnivîserekî profesyonel im.

Memet Oncu (Hemo Peşeng:

Navê min Hemo ye, belê ji ber ku di wan deman de, li bakûrê welêt, navên Kurdan ne li gor daxweza wan, li gor çarçoveya ku dewletê ji hemwelatîyên xwe re xêzkirî dihatin danîn weke “Mehmet” hatiye nivîsîn û wîsa jî maye. Paşnavê min Oncu ye, di Kurdî de wateya “pêşeng, pêşewa” dihêwirîne, mixabin ew jî malbata min nepejirandiye, dewletê bi hawakî ketober paşnav li hemwelatîyên xwe ên Kurd dikirin, wîsa pêkhatîye, lew ku ne peyvendiya min ne jî ya binemala min bi pêşeng û pêşewatîyê re tune.

Ez di sala 1961 an de li şarî Adiyeman (Semsûr) ji dayik bûm. Min dibistana seretay û ya navîn (Bekelorya) li Adiyemanê (Semsûr) xwend. Min di 18 saliya xwe de deşt bi tomariya folklorê Kurdan kiriye. Heta sala 1985 an min gelek helbestên bi zarê Tirkî nivîsandin. Wê demê helbestên min ên bi zarê Tirkî hatî nivîsîn di kovarên weke Tûrk Edebiyatî (Edebiyata Tirkî) û Adam Sanat de hatin weşandin. Ji ber ku wan kovaran helbest û nivîsên min ên bi zarê Kurdî neweşandin, min jî dev ji nivîsa Tirkî berda û ji wê pê ve deşt bi nivîs û nivîsarên Kurdî kir. Di sala 1990 û ji wê pê ve gelek helbest, gotar û nivîsarên min di kovar, rojname û malperên înternetî ên weke Kulîna Kulîlkan, Azadiya Welat, Rewşen, Govend, Medya Gûneşî, Tîrêj, Nûbihar, Dilop, Kovara W, Zend, Deşt, Depdar û hîn gelekên din de weşîyan. Min di sala 1983 yan de, di wezareta perwerdeyê de, li Şarî Adiyeman (Semsûr), weke mehmûr deşt bi kar kir.

Di sala 1992 an de min li Zanîngeha Anatoliyê, beşa Kargêriyê qedand. Min û hevalên xwe li Adiyemanê (Semsûr) Rojnameyeke ku bi Kurdî weşanê dike derxist. Di wê rojnameyê de demekê min di qûncikê xwe yê bi navê “Kenêrk” de gotar û nivîsarên li ser folklorê Kurdî nivîsandin. Ez di sala 2017 yan de ji wezareta Çand û Geştiyariyê malnîşîn bûm. Ez îro, li Şarî Adiyeman (Semsûr) dijîm zewicî, bavê du keç û kurekîme. Min di gelek mijaran de berhemên folklorîk û wêjeyî nivîsandine hîn jî li ser Folklor û Edebiyata Kurdan di nav hewldan û xebatan de me. Berhemên ku min nivîsandî û hatine çapkirin wek ên li jêr in.

Berhemên Min

- Çîrokên Kurdan-I, -Zargotin- Weşanên Doz-2006 (Ew berhem ji 400 heb kurteçîrokên gelerî pêk tê)
- Çîrokên Kurdan-II -Zargotin- Weşanên Doz-2007 (Ew berhem ji 350 heb kurteçîrokên gelerî pêk tê)
- Gotinên Pêşîyan- Ferheng/ Zargotin-Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê-2009 (Ew berhem ji 9000 Gotinên Pêşîyan ên ku yek û yek hatî şirovekirin pêk tê)
- Mêhrîmah -Helbest -Weşanên, J&J 2011
- Ezîze -Helbest- Weşanên J&J- 2011
- Eware -Helbest- Weşanên- J&J-2011
- Yeklo Duklo Dumbazê, -Zargotin- Weşanên J&J-2013 (Ew berhem ji gelek zûgotin û jimarokên ji qadê hatî komkirin pêk tê)
- Dengbêj û Dengbêjî –Gotar- Antolojiya Dengbêjan, Şaredariya Mezin a Amedê-2013
- Meyîr, Çanda Pêjîngeha Herêma Amedê-Folklor-Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê-2013 (Ew berhem li ser pêjîngeha Şarî Amed hatiye nivîsîn, li Bakurê Kurdistanê cara yekê berhema li ser pêjîngehê û bi zarê Kurdî hatiye nivîsîn)
- Cemîle, Çanda Pêjîngeha Herêma Semsûrê-Folklor-Weqfa Danasîna Adiyamanê-2014 (Berhem cara pêşî bi Kurdî hatîbû nivîsîn, ji ber ku weşanxaneyan xwe neda ber barê çapa wê, min wergerandiye Tirkî, berhem bi

zarê Tirkî hatiye çapkirin. Kurdiya wê heye heye, ji ber kêr derfetiye nehatiye çapkirin)

- Çîrokên Efsaneyî yên Kurdan, Zargotin- Weşanên Nûbihar- 2014 (Ew berhem ji 72 çîrokên Kurdan ên efsaneyî pêk tê, li qadê hatine berhevkirin)

- 101 Biwêj 101 Çîrok-1, Zargotin, Avesta-2015 (Ew berhem ji 101 çîrokên biwêjan pêkhatiye)

- 101 Biwêj 101 Çîrok-2 Zargotin, Sîtav-2024 (Ew berhem piştî ya yekemîn cara duyem ji 101 çîrokên biwêj ên cûda hatiye pêkanîn)

- 101 Biwêj 101 Çîrok-3 Zargotin, (Ew berhem li ber çapê ye)

- 101 Biwêj 101 Çîrok-4 Zargotin, (Ew berhem li ber çapê ye)

- Ferhenga Biwêjan, Ferheng/ Zargotin-Weşanên Sîtav-2016 (Ew berhem ji 8000 biwêjên şîrove kirî hatiye pê)

- Ferhenga Biwêjên Kurdî- Ferheng/ Zargotin- Weşanên Sîtav-2024 (w berhem ji 15000 biwêjên kurdî ên li qadê hatî berheevkirin û yek û yek hatî şîrovekirin pêk tê, ku heye çîrokên wan jî li bin şîroveyan hatine nivîsandin)

- Çarîne (Ji Kaniya Dil) -Helbest)- Weşanên Sîtav-2016 (Ew berhem ji 500 çarînen ku min nivîsî pêkhatiye)

- Ji Deftera Kurdekî, Aforîzma/ Gotinên min ên bi kakil, Weşanên Sîtav-2016 (Ew berhem ji 200 aforîzmayên ku min nivîsî pêkhatiye)

- Şihîna hespên azad-Roman-Weşanên Sîtav-2017 (Romaneke dîrokî ye, lehengê wê Osman Sebrîye û ronahî li serdema ku ew tê de jiyî digre)

- Tiştanokên Kurdî, Zargotin, Weşanên Dara-2017 (Ew berhem ji 1000 heb mamik û tiştanokên ku li qada xebatê hatî tomar kirin pêkhatiye)

- 101 Gotinên Pêşîyan 101 Çîrok-Zargotin- Nûbihar-2018 (Ew berhem ji 101 çîrokên Gotinên Pêşîyan pêkhatiye)

- 101 Gotinên Pêşîyan 101 Çîrok-2 Zargotin- Nûbihar-2024 (Ew berhem cara duyem ji 101 çîrokên Gotinên Pêşîyan ên cûda hatiye pêkanîn)

- 101 Gotinên Pêşîyan 101 Çîrok-3(Ew ber hem li ber çapê ye)

- 101 Gotinên Pêşîyan 101 Çîrok-4(Ew ber hem li ber çapê ye)

- Serhatî û Serboriyên Kurdan-Zargotin-Weşanên Sîtav-2019 (Ew berhem ji 400 kurteçîrokên ku ji gotinên pêşîyan û biwêjan re bûne mijar pêk tê)

- Guldesteyek Ji Pêkenokên Gelêrî, -Zargotin-Weşanên Sîtav-2019 (Ew berhem ji 400 pêkenokên ku ji gotinên pêşîyan û biwêjan re bûne mijar pêk tê)

- Kulîlk û Şikevlatû (Fablên Kurdî), -Zargotin-Weşanên Sîtav-2019 (Ew berhem ji 200 fabilên ku ji gotinên pêşyan û biwêjan re bûne mijar pêk tê)
- Ferhenga Devoka Hereêma Semsûrê-Ferheng-Zargotin Weşanên Sîtav-2019 (Ew berhem ji 9000 peyvên heremkî ku heryek ji wan hatî senîfandin û şirovekirin hatiye pê)
- Di Gotinên Pêşyan de Jin-Zargotin-Weşanên Sîtav-2020 (Ew berhem ji 2000 Gotinên Pêşyan ên ku li ser jinan hatî gotin pêk tê. Her gotinek bi serê xwe hatiye şirovekirin, min wariantên wan anîne gel hev û ku heye min çîrokên wan jî li bin gotinê nivîsandine)
- Gotinên Pêşyan (Senîfandin - şirove - Ferheng /Zargoyin Weşanên Sîtav 2020 (Ew berhem ji 4 bergan pêk tê, 5000 rûpele. Di berhemê de nêzî 50.000 Gotinên Pêşyan hene, piraniya wan (% 75) li qada xebatê û ji devê jêderkan hatine berhev kirin. Gotinên di berhemê de li gor mijaran (235 mijar) hatine dabeş kirin. Gotinên her beşeke, de di nav xwe de di rêza abc yê de hatine rêzandin, yek û yek hatine şirovekirin. Waryant û guhertoyên her gotinekê ligel hev hatine nivîsîn ku heye çîrokên wan jî li bin wan hatine nivîsîn)
- Eskî Kûrt Tarîhî -Werger)- Weşanên Sîtav- 2020 (Ew berhema Mîrza Mihemed Aqoyî ji Kurdî hatiye wergerandina Tirkî)
- Antîk Kurdistan- Werger Berhema Elî Tetar Nerweyî ji Kurdî hatiye wergerandina Tirkî)
- Raperina Baba Îshaq (Roman) Weşanên Sîtav-2021 (Romaneke dîrokî ye, ronahî li serdema ku Baba Îshaq tê de jiyaye digire)
- Êl û Binemalên Li Derdora Semsûrê- Weşanên Sîtav-2021 (Ew berhem li ser êl û hozên li herêma Adiyemanê agahî û danasînan dihêwirîne, di derbarê dîroka wan de agahiyan dide)
- Adiyaman ve Çevresî Aşîretlerî – Weşanên Sîtav -2021 (Ew berhem bi zarê Tirkî hatiye nivîsîn, di derbarê êl û hozên herêmê de agahiyan dide)
- Gogercîna Perbiçîn- Roman-Weşanên Sîtav -2021
- Destana Şêr û Pisikê (Ew berhem ji hêla Med-Derê ve, di sala 2021 de hatiye weşandin. Berhem ji 40 rîşteçîrokên ku min ji bo zarokan, şêwaza çarîn û 7 kiteyî nivîsandî pêk tê. Hemû çîrokên di vê berhemê de fabilin û min ew fabil li qadê berhev kirine)
- Li Herêma Adiyemanê Çend Portreyên Şopwenda-Weşanên Sîtav-2021 (Ew

berhem di serdema antîk de bigir heta roja me, kurteportreyên 150 kesan dihêwirîne. Ew kesên ku di vê berhemê de kurteportreyên wan hatî nivisîn, kesên ku pergala heyî nexwestine ew bêne nasîn in.)

•Bi Çavê ê Din Adiyeman, Weşanên Sîtav (Ew berhem bi çavên Kurdekî Şarî Adiyeman (Semsûr) dide nasîn)

•Ji Tûrikê Kal Pîran Çend Morî û Mircan-Zargotin-Weşanên Na

•Mij- Roman- Weşanên Sîtav 2020 (Ew berhem romaneke sêbareye, berga yekem Helkîna Bayê xerbî, berga duyem Peşkên Baranê, ya sêyem jî Pirîskên Berfê ye.)

•Jiyanek, Bajarek û Serdemek-Bîranîn- Weşanên Sîtav-2025

Prensîpên nivîsîn û amadekirina ferhengekê çi ne?

■ Zana Farqînî

Berî her tiştî divê haya mirov ji ferhengê ango ji pênaseya ferhengê hebe. Loma jî heta li ser pênaseya wê mirov ne xwedî ramanekê be, bi mirov re sînorên wê zelal nebe, dibe ku berhemeke cuda derkeve holê û di heqê ferhengê û awayê amadekirina wê de, fam û ferasetên mirov ji hev cuda bin. Îcar çendî gelek pênaseyên ferhengê hebin jî, ji bilî kitekitên cuda ew pênase pir dişibin hev û aliyên pênaseyên wan ên hevpar zêditir in. Ji lew re jî em dê li gorî zanîna xwe pênaseyeke wê ya giştî bidin.

Pirtûk yan jî çavkaniya elektronîk e ku bêjeyên zimanekî (yan jî ji yekê zêde ya çend zimanan) bi awayekî alfabetîk lişte dike, cureyên wan diyar dike, manayên wan dide yan jî bêjeyên hemtayên wan ên di zimanekî cuda de derpêş dike û bi awayekî giştî di heman demê de, der bareyê bilêvkirin, reh û bikaranînan wan de jî zanyariyan pêşkêş dike. Li gorî vê pênaseyê divê ferheng gemcîneya peyvên zimanekî li gorî rêza alfabetî nîşan bide, cureyên peyvan aşkera bike, koka (etîmolojiya) wan diyar bike, awayê bilêvkirina peyvan bide xuyakirin, wan bi mana û rave bike, hevmanayên (sînonîmên) bêjeyan daîne ber wan, eger di zimên de zayendî hebe divê zayenda peyvê jî diyar bike û bi hevokên nimûneyî jî karê bikarhênerên ferhengê hêsan bike.

Elbet ev yek bêhtir ji bo ferhengeke yekziman e, lê di ferhengên duziman yan jî pirziman de dibe ku serî li dayîna nîşandana etîmolojiyê neyê dayîn. Ev tercîha amadekarê ferhengê ye. Tevî van yekan, divê amadekarê ferhengê biryara xwe dabe ku dê ferhengê ji bo kê û li ser çi amade bike, girseya armanckirî kî ne û hwd. Wekî tê zanîn, gelek cureyên ferhengan hene. Min navê ez bi teferruat behsa wan bikim, lê eger mirov behsa çend heban bike jî dê ji aliyê aşkerabûn mebestê ve baş be.

Ji aliyê hejmara zimanî ve ferhenga yekziman, duziman û pirziman, ji hêla alfabetîkbûn yan jî nealfabetîkbûnê ve ferhengên alfabetîk û ferhengên têgihan (ferhengên mijarî), ji aliyê wesfa hildana dest a gencîneya peyvan ve jî ferhengên giştî (ferhengên zimanê hevpar, zimanê nivîskî), ferhengên zaravanasîyê (ferhengên devok û zaravayan, ferhengên berhevkarîyê), ferhengên hêmanên hevmana, hevdengî/homonîm û diimanayî, ferhengên hêmanên biyanî, ferhenga bêjeyên biyanî, ferhengên dîrokî (ferhengên ku dewreke diyar ji xwe ra dikin mijar, ferhengên vesehîkirinê), ferhengên rîşalnasîyê/etîmolojiyê, ferhengên terman (ferhengên warê pisporiyê), ferhengên argoyê, ferhengên dibîstanan, ferhengên biwêj û gotinên pêşîyan, ferhengên stîlîstîkê, ferhengên hunermend û nivîsaran/tekstî, ferhengên bêjeyên ku şaş tîrîkî bikaranîn, ferhengên berevajî/berepaşî (ferhengên ku li gorî herfa paşî tîrîkî birêzîkin) ferhengên hêmanên nû û hwd.

Piştî mirov ji xwe re rêbaz û armanc diyar kir, dê kîjan berhengê amade bike û ji xwe re sînor danî bi şûn de, êdî mirov dikare bi dilekî rehet dest bi karê xwe bike. Ka ew ji aliyê ziman ve ferhengeke çawan e, tema li ser çî ye û girseya armanckirî kî ne, wek prensîp ji mirov re çarçove diyar dibe.

Mesela ferhengên ku min ew amade kirine ferhengên duziman in û ez li ser etîmolojiya peyvan ranewestîme û min sînor ji xwe re danîne.

Nivîsîna ferhengê heta çî radeyê xizmeta zimanê yekgirtî yê kurdî dike?

Ji bo zimanekî nivîskî pêwîstî bi sê stûnên sereke heye: Alfabe, rêziman û ferheng. Ev her sê stûn, bingeha zimanê nivîskî pêk tîne. Îcar zimanê nivîskî jî hem zimanê hevpar e hem jî zimanekî standard e.

Ferheng jî ji bo bikarhênerên zimanî rêberek e, çawan ew der heqê

raştivîsîna peyvê û manaya peyvê de dibe alîkar û di van warên amajepêkirî de bingeha zimanê standard xweş dike. Ev jî dibe sedem ku di warê zimanê nivîskî de pergalek çêbe. Bi kurtasî ew rênîşander e û xizmetê ji bo pêkhatina zimanê nivîsînê dike, vî awayê zimên jî berbelav dike.

Peyv û termên herêmî ji bo zimanekî standard ê kurdî çi qas bikêr in?

Serê pêşî divê em behsa du aliyên zimên bikin; zimanê devkî û zimanê nivîskî. Standard di zimanê nivîskî de heye, lê ev yek di zimanê devkî de nîn e. Di zimanê devkî û di devokan de cudahiyên bilêvkirina heman peyvê heye, her wisan dibe ku ji aliyê watayê (manayê) ve jî heman bêje xwedî watayeke din be.

Ev aliyekî mijarê ye, aliyê din jî rewşa zimanê kurdî bi xwe ye. Loma mirov dê li gorî çi pîverê daxuyîne ku filan peyv herêmî ye û sînorên vê yekê bi çi tê peyitandin ango tesbîtkirin hîn ne zelal e. Eger standardeke me ya berbelav hebûya, her cure ferhengên me amadekirî bûna, ferhengên me yên etîmolojiyê li ber dest buna, dibû ku xeteke diyar a di navbera zimanê standard û peyvên herêmî de hebûya û mirov tavilê tê derxişt a ku ew peyv, têgih û term ên devokekê ne, herêmî ne û di zimên de zêde ne berbelav in.

Ez wisan difikirim ku ev pîvan û pîver ji ber tam ne zelal û aşkera ne, niha hewcehiya me bi berhevkirina hemû peyv, biwêj (îdyom) û gotinên pêşyan heye û divê di ferhengan de bîr bicihkirin û tomarkirin. Ji bo min pêşî tesbîta gencîneyan peyvan û paşê jî xebatên ji bo standardkirinê hîng giringtir e. Hebûna ferhengan, tomarkirina peyvan elbet karîgeriyeke baş li zimanê standard dike û ev jî bo me

çavkanî û jêderk in. Em ji bîr nekin ku analîz li ser zimanê nivîskî tê kirin, ne li ser zimanê devkî.

Ew kesên ku ferhengên biyanî werdigerînin yan jî amade dikin, ji bo kurdî çî qas xizmeta zimanê kurdî dikin.

Hewcehiya me bi ferhengên duziman yan jî bi yên pirziman jî heye û pêdiviyekê dabîn û bîter dikin. Her çendî bi piranî ev cure ferheng ji bo hînbûna zimên bin jî, lê ew karîgerî li bergeha zimên jî dikin, dibin sedem ku rêyên vegotinê, qalib, çemk û termên din jî li kurdî zêde bibin. Bi saya van ferhengên hanê, mirov bi pêwîstiyên xwe yên zimanî jî dihise û hewl dide ku kil û kêmasiyên xwe yên zimanî ji holê rake.

Lê ji bo ferhengên wiha divê rêbaz ne werger be, divê mirov berginda wan peyvan, wan qalib û biwêjan bide, eger berginda wê peyvê nebe divê yan mirov têkilî pê nake yan jî serî li rêya dariştina peyvan bixe. Elbet ev jî ne karekî hêsan e, hewce bi pisporî û behreya (qabiliyeta) zimanî heye. Divê mirov ji aliyê rêziman ve zimanê xwe baş bizane, haya mirov ji gireyên (wekî pêşgir û paşgiran) hebe, bi çî çî cure peyv tê dariştin, her wisan bi morfolojiya zimanê xwe jî bizane ka li gorî kîjan rêzik û rêsayê peyv tên ba hev û hwd.

Jixwe hema bibêje tu zimanekî xwerû (saf) nîn e û tu zimanekî ku dest lê negeriya be, ji derve ve bi awayekî îradî maytêkirin (midexale) lê nehatibe kirin û jê re peyv nehatibin çêkirin jî tune ye.

Ev ferheng hem zimanê kurdî hînî biyaniyan dikin, hem rê li ber kurdî xweş dikin hem jî zimanê kurdî didin naskirin. Bi van aliyên xwe ve jî ji bo zimanê kurdî xizmeteke hêjayî pesindanê dikin.

Zimanê kurdî heta çî radeyê ji ferhengeke berfireh ji bo hemû zarên kurdî sûd wergirtiye?

Berî her tiştî ferhengeke kurdî ya ji hemû zaravayan pêkhatî mixabin hîn tune ye ku jixwe ew pêdiviyê me ya bivênevê ye. Hebûna ferhengeke kurdî dê bibe sedem ku hemû kurd ji zaravayên xwe haydar bibin û jê sûdwer bibin. Îcar ev rewşa kambax li aliyekê, bi ya min em neşên bibêjin ku hemû kurd der bareyê xebatên zimanî de ji hev agahdar in û hewcehiyên xwe yên zimanî jî ji hev dabîn dikin.

Tevî vê yeke, di van salên dawî de zaravayên kurdî li hev hîkarî kiriye, ji hev peyv, çemk û terman wergirtine. Wekî nimûne, di navbera kurmancî û soranî de danûstandinek çêbûye, kurmancî çawan ku daye ji vî zaravayî jî gelek peyv standine û bi wan kêmasiyên xwe ji holê rakirine. Wekî peyva komar, şano, şanoger, reftar, peştî, fişar, danişîn, peyamnêr, dabîn kirin, pêşewa, pêwîst, parêzer, parêzgar, mûşek, takekes, zanişt, zaniştî û hwd.

Em hîn jî li bakur gava xebatan li ser standardkirina kurmancî dikin, em serî li hemû zaravayên xwe jî didin, em dibêjin ka em bala xwe bidinê bê di soranî de berginda filan peyvê heye, yan jî bilêvkirina wê ango raştînivîsîna bêvan bêjeya kurmancî di vî zaravayî de bi çi awayî ye. Kin û kurmancî zaravayên din ên kurdî ji bo standardkirina kurmancî rênîşander in û çavkanî ne.

Ferhengên kurdî û zimanê kurdî heta çi radeyê ji ferhengên zaniştî û hiqûqî sûd wergirtiye?

A raşt ez tam di vê pirsê negihîştim, gelo mebest ji ferhengên zaniştî û hiqûqî çi ye? Ew ferhengên termên zaniştî û pîşeyî yên bi kurdî ne yan jî yên bi zimanê biyanî ne? Li gel vê rewşê jî wiha bibêjim, berî her tiştî amadekarê ferhengê armanca xwe û cureya ferhenga xwe diyar dike û li gorî wê serî li çavkaniyan dide. Lê hin termên teknîkî, pîşeyî,

felsefî û şaxên zaniştên cur bi cur hene ku em li kurdiya wan, yan jî ez ji bo kurmancî bibêjim em li berginda wan digerin, lê em wan peyda nakim. Mixabin di van waran de hewcehiya zimanê me hîn nehatine dabînkirin.

Ji bo vê pirsê ez gotinên dawî bibêjim. Ez ji komxebatên li ser termên zimannasiyê, termên perwerdeyê û termên hiqûqî dizanim ku pêdivî bi dariştina terman heye û ev jî ji xebatên takekesî bêhtir bi xebatên komî/kolektîf pêkan e.

Rasparede û pêşniyazên we ji bo nivîsîna ferhengeke berfireh a zimanê kurdî çi ne?

Ji bo amadekirina ferhengeke kurdî ya berfireh, eger mebest jî vê gotinê ew ferhenga jî hemû zaravayan be, di serî de hewcehî bi dezgeheke zimanê kurdî heye. Di vê dezgehê de jî divê zimannas û pisporên kurdî yên jî hemû şêwezaran hebin.

Ji bilî vê, pirs a giring ev e: Ev ferheng dê bi kîjan zaravayî (diyalektî) û bi kîjan alfabeyê bê amadekirin? Her wiha ev ferheng dê ji bo zaravayan beş bi beş bê amadekirin yan jî hemû peyv li gorî rêza alfabetîk di nav hev de bînin derpêşkirin û her wisan di nav kevanekê de bi kurtebêjeyan aîdbûna peyvê ya wî zaravayî bê nimandan. Yan jî ferhengeke berawirdî ya zaravayan dê bê amadekirin. Ev pirs û pirsên din pêwîst e ku bînin zelalkirin.

Wekî nimûne, ferhengên ku min amade kirine, ferhengên duziman in û bi tirkî-kurmancî, kurmancî-tirkîne. Du heb jê bi awayê berfireh in (Ferhenga Tirkî-Kurdî ya Mezin, Ferhenga Kurdî-Tirkî ya Mezin) û ya sêyem jî ferhengeke navincî ya bi Kurdî-Tirkî Tirkî-Kurdî ye. Çendî ji zaravayên din ên kurdî sûd hatibe wergirtin jî, lê bîngeha wan kurmancî ye.

Gelek kesan bi derfetên xwe yên zêde ne guncaw, di van waran de kar û xizmetên şayanî teqdîrê kirine, lê demek berî demekê hewce pê heye ku ev bi awayekî kolektîf û dameziraweyî bîn kirin. Saziyeke zimanî ya ku hemû kurdan temsîl dike şert e.

Yek Ji Encamên Asîmîlasyonê: Lixwenebanbûn

■ Dr. Dilawer Zeraq

Asîmîlasyon, wekî demajoyeke ku destpêka wê dîyar e û dawîya wê tune ye, xwedî çend encaman e ku ji alî netewe-dewletên mêtînger ve, li ser gel-neteweyên bindest û axa wan dagirkirî, wekî amrazeke serdestî û desthilata derveyîn, bi armanca ‘wekxwekirin’ê tê meşandin. Lixwenebanbûn, yek ji wan encamên ketî behsê ye ku di demajoya pêkanînên asîmîlasyonê de, li kes û endamên neteweyên bindest (kirî) û marastî (exploited) diqewime.

Peyva ‘neban’ di ferhengên kurdiya kurmancî-tirkî de wiha tê pênasekirin: 1) “neban: wek termeke zoolojiyê û civati, lawîreka mê ya nûzayi ya ku çêleyeka xwe ya sawa hinê mêtîna bi guhanê nake. (Bozarslan, 2018: 333)” 2) “neban (II): 1. alışık olmayan 2. yavrsunu emzirmeyen hayvan. (Farqînî, 2004: 1270)” 3) “neban: yê hinde tiştan na pejirînî, nemaze kewalên mê, dema kar yan berxê xwe wernagirit û nahêlit şîrê wê bixot” (Botî, 2007: 433). Di her sê pênaseyan de tiştê hevpar, jixwedûrkirina makê ya berxa xwe ye. Yanî, heyînek heye û ji heyîn (û tiştê) ji derveyî xwe re sar dimîne û jê dûr dikeve. Loma jî, em ê ji vê deqband (kontekst) û çarçoveyê bidin ser rê û wekî wateyê mecazî, vê wateyê, ji hêla makê ve ku ji berxa xwe dûr dimîne, qebûl bikin û bi wateya ku di warê civakî de tê bikaranîn, bi kar bînin. Em ê peyva neban bi temamî bi wateya, ‘sarbûn, dûrketin, jêçixîn, jêqetîn û jêveqetîna ji xwe, ji heyîn an jî ji tiştêkî ji xwe û nêzî xwe’yê bi kar bînin.

Di warê hîskirin û hayjêbûna heyîniyê de, jihevcihêkirina ‘ez û ew’ê çî di nav çandekê de çî jî di navbera çandan de, qada xwe berfiretir dike û di ser vê berfirehiyê re tê famkirin. Wekî mînak; mirovên ku bawerî bi dînekî tînin an jî nayînin, mirovên ku ji herêmekê ne an jî ne ji herêmekê ne, mirovên ku maldar in an jî xizan in, mirovên ku ji heman komên etnîkî ne an jî ne ji etnîsîteyekê ne... Ev jihevcihêkirin hemû di roja îroyîn û di biwara têgihdariyê de tê li ser têkiliya ‘ez’ û ‘dîke’yê dimîne. Dîke (other), li derveyî ‘ez’ê ye û ne derbar ‘ez’ê ye. Em ê di

vê qonaxê de teoriya Lacan ya neynikê bînin bîra xwe û bi kurtasî bêjin; Ez, ji bo ku heyî be, ji bo ku were famkirin û hem ew hay ji xwe bibe û hem jî mirovên din hay ji hebûna wî/ê bibin, xwe diyar û pênase dike. Gava ew vê yekê dike, di heman demê de, xetêke û qadeke ya xwe jî diyar dike; û pê re jî xet û qada heyîna din jî diyar dike û “Ancax dikare bi pênasekirina van qonaxan bibe ‘ez’” (Kiraz, 2011: 153).

Helbet nebanbûn, ne tenê yekalî ye. Heke em nebanbûnê yekalî bifikirin û bêjin, ‘ez’ek heye û hemû heyînen ji derveyî wê ‘ez’ê neban in jê re, nexwe hemû heyîn ji bo hev an neban in an jî ne neban in. Loma jî, nebanbûn têgiheke wisan e ku berê wê bi xwenaskirinê ve ye jî. Digel wê, kirdeyek ji bo xwenaskirinê hewceyî ‘ez’êke dîtir e û divê wê heyînê jî nas bike. Hegel di diyalektîka ‘efendî-kole’yê de ev yek daniye rastê û dibêje; “Efendî kole nakuje. Ji ber ku efendî ‘xwebûniya xwe ya serbixwe’ deyndarî ‘xwebûniya nesarbixwe ya kole’ ye” (1986: 143). Gava em bi baldarî li vê pênaseyê dinêrin, dibînin ku teoriya Lacan ya neynikê û diyalektîka Hegel ji aliyê ‘hevdivêtiya kirde û tiştê’yê de digihîjin hev. Em di ewledariya vê pevgihîştinê de dikarin bêjin, ‘neban(î) û nebanbûn’ ne yekalî ye, lê dualî ye; ev dualîbûn li ser dîkekirinê (otherization) dibe xwedî bingehekê û ji bo hatina naskirinê û ji bo danîna xwebûn(iy)a xwe, -çi serbixwe çi ne serbixwe- her du alî hev divên.

Nexwe em dikarin bêjin, qonaxa dîkekirinê ji aliyekî ve demajoya nebankirinê ye jî. Ji ber ku gava kirdeyek xwe pênase dike, tiştêyekê jî ji xwe re diyar dike; û bi vê diyarkirinê re tiştêyê ji xwe dûr dike; û bi vê dûrkirinê re jî wê ji bo xwe dike heyîneke ‘xerîb, biyan, namoyî û dereke.’ Dominique Schnapper behsa vê têkiliya ku li ser neyîniyê ava dibe, dike, li ser du şeweyên vê têkiliyê dimîne û dibêje,

“A yekem, ‘Reftara ciyawazkerî ye ku cihêtiya di navbera heyînan de heyî tê çespendin. Ev ciyawazî bivênevê li ser hîma ‘kêmbûn’ê tê avakirin. Yanî gava aliyek pênaseya xwe dike, dixwaze bêje, taybetiyên

erênî ku bi min re hene bi ‘heyîna din’ re tune ye” (2005: 25 -26).

Reftara ciyawazker, dîkeyê hem wekî heyîn qebûl dike hem jî wê neyîn (red) dike û van kirinên xwe jî bi dorê dike; pêşî ciyawazkirinê piştî jî neyînkirinê pêk tîne. Ev awa pêwendiya ku bi dîkeyê re tê danîn, gelek rûxîner, tuneke û neyartîhez e. Herçî şêweyê dîtir yê vê pêwendiyê ye, Schnapper di barê wê de dibêje,

“A duyem, ‘Li ser bingeha gerdûnîkerî û asîmîlekerî ava dibe. Ev reftar dibêje, mirov tenê ji ber ku mirov in wekî hev in; û bi vî awayî jî dixwaze bêje, dîke ‘ew’ eke dîtir e. Yanî, ‘dîke’ divê wekî ‘ez’ê be, ya ku gerdûnî ye di nav çanda ‘ez’ê de tê asîmîlekirin. Ev jî ew şêwe ye ku rengê xwe dide dîkeyê û bi vî awayî wê tune dike” (2005: 27).

Di vê reftarê de, jixwedûrkirina dîkeyê nakeve behsê. Lê belê çendî ku dîke wekî tiştîyekê di nav kirdeyê de diheve, ew çend rengê wê digire û dîsa ji rengê hebûna xwe, ji pênaseya xwe, ji hayjêbûna xwe dûr dikeve û dîke, -yanî tiştîya kirdeyê- bi awayekî ji awayan dîsa tê neyînkirin.

Me di destpêkê de gotibû, nebanbûn demajoyeke dualî ye. Heta vê derê em li ser yekalîbûnê man ku ew jî li ser ‘kirde-tiştî’ yê ava dibe ku aliyek her tim kirde aliyê din jî her tim tiştî ye, yanî dîke ye. Îcar, aliyê duyem yê nebanbûnê ew e ku; mirov bi xwe hem bibe kirdeya xwe hem jî tiştîya xwe; yanî mirov bi xwe bibe dîkeya xwe.

Di vê qonaxê de, mirovek kîngê xwe bide ber bayê guherînê hingê dikare nêzî xwe bibe û dikare bi xwe re têkiliyeke ‘kirde-tiştîyî’ dayne. Gava mirovek bi hişberiyekê dikeve nav demajoya guherînê, bi vê kirina xwe re dibetîya lixwenebanbûnê jî mimkun dike. Em dikarin bêjin; her tiştî ku diguhere hin tiştî û taybetiyên ji teşî û dirûvê xwe yê berê wînda dike. Heke wîha ye, nexwe di nebanbûnê de jî guherînek li dar e. Guherîn, di heman demê de, kirasguhertin e jî; û ev yek hem dikare ji hêla derveyî ve hem jî ji hêla navxweyî ve pêk bê. Loma jî, heke kirasguhertin parçeyek ji guherînê be, nexwe “...nebanbûn; bi

wateya giştî, bûyîna kesekî ji bilî xwe an jî veguherîna li kesekî ji bilî xwe ye...” (Timuçin, 1992: 16- 23).

Hemin ku her heyîna ku diguhere, êdî rengê xwe yî berê winda dike û dibe tişteki nû yê dîtir; û hemin ku “Her guherîn bi awayekî ji awayan nebanbûn e jî” (Kiraz, 2011: 161), em dikarin bêjin; mirovê lixwenebanbûyî mirovekî nû yê dîtir e jî. Pê re jî em dikarin bêjin, nebanbûna ku bi ‘bûyîna’ tişteki din, bi ‘bûyîna’ heyîneke din li mirovan diqewime, zêdetir ji ber bandorên derveyî in û mimkun e ku guherînen hundirîn ne li ser hîm û bingeheke xurt bin. Ji ber ku her çend di ‘bûyîne’ de guherîn hebe jî, ev guherîn ne li ser vîn û hişberiyê lixweşiyar e. Loma jî, dibe ku her guherîn ne guherîneke erênî be. An jî, dibe ku her guherîn, wekî dongiyekê, ‘nebanbûneke’ erênî bi xwe re çêneke. An jî dibe ku nebanbûna di vî warî de dikeve behsê, ji nebanbûnê zêdetir, tunebûn û windabûn be.

Her wisa, ji bo ku em karibin xweşikî ji ‘guherîn’ê fam bikin, -ya ku Kiraz behs jê dike û wateyê erênî ya nebanbûyîne lê bar dike-, pêwîst e em berê xwe bidin demajoya ‘xweguhertin’ û ‘xweavakirin’ê. Loma jî, em ê ji serî de hizira xwe daynin û bêjin; ‘xweavakirin’ ne bi ‘guherîn’ê pêk tê, lê belê bi ‘xweguhertin-xweguherandin’ê pêk tê. Ji bo ‘xweguhertin’ê, li mirov merc e ku çandekê biafirîne da ku karibe hem têkiliya xwe ya bi xwe re hem jî têkiliya xwe ya bi xwezayê re saz bike. Ji ber ku mirov bi çanda ku afirandiye, têkiliyên xwe saz dike û çî gava dikeve qonaxa xweguhertinê, ‘xweavakirin-xwepêkanîn’ek jî li dar dixê. Li hêla din, nebanbûyîna kes û takekesan û nebanbûyîna girseyî (an jî civakî) jî hene ku hin caran di civakekê de bes beşek an jî hejmarek mirov hene ku nebanbûyîna li wan diqewime. Karl Marx, hem wekî girseyî hem jî wekî takekesî li ser nebanbûyîne disekine. K. Marx, piştî ku li ser berhênana mirovan ya bi xwe bi xwe re, ya bi mirovên din re û ya bi xwezayê re disekine û wan dadihûrîne, pênasê xwe li ser hîma ked û berginda kedê datîne û dibêje;

“a) di pergala kapîtalîst de, kesên ku dixebitin ne di sehitiya xwe lê di sehitiya karsaz de ne, loma jî li keda xwe neban in, b) ji ber ku berhema ku kedkaran ew hilberandiye ne ya wan e lê ya karsaz e, kedkar li berhema xwe neban in, c) mirovê ku li keda xwe li berhema keda xwe neban be li xwe jî neban e, d) mirovê ku li keda xwe neban bûye li heyîn û mirovên derveyî xwe jî neban e” (Marx, 2007: 28- 2931-30-).

Di pênasikirina Marx de, bala me diçe ser, ‘xwedîbûna keda xwe.’ Û hema di pey re jî gava em bala xwe didin pênaseya Hegel ku li ser nebanbûnê dibêje,

“Ez’a ku hê negihîştîye hişberiya hebûna xwe, (tez) ji bo ku bigihîje hişberiya hebûna xwe raştî heyîna ku ne ‘ez’ e, yanî raştî dikeyê tê (antîtez) û di dawiya vê lêraştîhatinê de, ‘ez’ êdî ‘ez’ek e ku gihîştîye hişberiya hebûniya xwe (sentez)” (Hegel, 1986: 33- 34).

Em dikarin bêjin, ‘he(xwe)bûniya’ ku bi pênaseya Hegel dide der û nebanbûyîn di ser wê re tê pênasekirin, li ba Marx, bi rengekî din, bi rêya kedê û ‘xwedîbûna keda xwe’ derdikeve raştê. Hegel di ser ruh, giyan û hayjihebûnaxwe re nebanbûyînê dide ber qonaxan û di dawiyê de awayekî azadiyê an jî hayjixwebûneke taybet dispêre takekesan. Marx jî vê azadiyê di ser xwedîbûna kedê re dide takekesan. Di pênaseya Hegel de nebanbûyîn takekesî ye, lê di pênaseya Marx de, nebanbûyîn hem takekesî hem jî girseyî (an jî civakî) ye.

Ji hêla din ve, ‘takekes’ carinan di nav girseyê de wekî ‘her kesî’ ye. José. O Gasset balê dibe ser vê rewşê û der heqê mirovê ku di nava ‘her kesî’ de dijî, wiha dibêje,

“Di dîroka mirovahiyê de, ji bo takekes sê qonax hene ku bi awayekî zêde û geremolî tim dubare dibin; 1) takekes heşt pê dike ku xwe winda kiriye, di tiştên derdora xwe de kûr çûye; ev dîkebûn e, 2) takekes bi hewldaneke xurt dikişe nav kozîka xwe û li ser tiştên li dorhêla xwe û li ser serdestiya xwe ya li ser wan hiziran çêdike; ev yek dikûrdeçûna xwebûn(iy)ê ye, 3) takekes car din li dinyayê xuya dike û li gorî pîlana

ku berê hatiye kirin, dest bi liv û tevgerê dike; ev jî çalakî, jiyana çalak, yanî praxis e.” (Gasset, 1995: 38)

Li ser van peytên Gasset bala me car din diçe ser pênaseya ‘jixwedûrketina’ ku Hegel behs dike. Ev pênase li ba Gasset dibe ‘xwejêdûrxistîneke bi (xwe)hişberî’ û ‘lixwevegerîna’ Hegel ku bi bandora tiştên derveyîn pêk tê li ba Gasset bi (xwe)hişberî diqewime û bi ‘çalakî’ li xwe vedigere, xwe heyî dike û nav lê dike ‘çalakiya jiyane-praxis’. Her wiha, Gasset bi van peytên xwe re bala me dibe ser takekesê di nav girseyê (civakê) de û em pê dizanin ku; gava mirov di nava ‘her kesî’ de ciyek bide xwe û piştî xwe li raştiya heyî (an jî li heqîqetê) bizivîrîne, li xwe neban dibe. Yanî Gasset jî, bi wateya lêçûnê (dirûvpêketinê) û bûyîna wek dîkeyê; ‘bûyîna wek her kesî, bûyîna wek dorhêlê û bûyîna kesê ji derveyî xwe’, wekî (li xwe)nebanbûyîn qebûl dike.

Yek ji hêmana ku têkiliyeke xwe ya nêz bi nebanbûnê re heye, çand e. Ji ber ku “Çand, awayekî mirovîkirina xwezayê ye” (Uygur, 2003: 17) ew bi xwe dibe kan û kewara nebanbûnê. Loma jî, di heman demê de, çand; warek e ku mirov bi xwe diafirîne, ava dike û tê de dijî. Û em dikarin bêjin, çand, wekî berhemê mirovan, ne xwezayî ye jî. Hemû tiştên di vê berhemê de ji xwezayê dûr in loma jî nebanbûn bi mirovan xuya dike û derdikeve rastê. Her wiha, mirov gava çandê diafirînin, li xwezayê neban dibin. Bi vê wateyê, çand qonaxa tiştên bûnê ye jî. Mirov ji bo ku xwe ava bikin, dikevin nav hin çalakiyan; çanda ku diafirînin, bi çalakiyên mirovane yên “bi rêya ziman, dîn, mîtos, huner, zanîstê” (Cassirer, 1980: 71), ji nifşekê vediguhêzînin nifşa dîtir û hebûna xwe, xwebûna xwe, hayjixwebûna xwe û çalakiyên xwe didomînin. Di domana vê demajoya veguhestinê de, çand jî mirovan bi pêş dixê û ji ber ku “Çand, helûmerca sereke ya hebûn(îy) a mirovan e” (Uygur, 2003: 18) bi pêdeçûna dem û qonaxên veguhestinê re, çand û hemû hêmanên wê, dibin rengekî taybet ya hebûna takekes û civakê.

Em dikarin li ser van pêzanînan hizirekê ava bikin û bêjin; hemin ku çand yek ji taybetiyên xweser û sereke ya civakan e û her civak xwedî çandêke taybet e; û ji ber ku her gel û komên etnîk, bi awayekî ji awayan û li gorî xwe, têkilî bi xwezayê re daniye û destkariyên xwe jî li gorî wê pêk aniye, jihevcihêtiya di navbera civakan de heyî jî diyardeyeke ne xwezayî ye. Loma jî divê guherînên ku di çanda civakekê de çêdibin dîsa bi destê endamên wê civakê ve bînin pêkanîn û çî gava, ji der de, ji alî çanda serdest ve, destkarî li çandekê were kirin, wê gavê çilvirîna (degeneration) wê çandî dikeve behsê; û çanda destkarî lê hatî kirin, bi hêmanên ku ‘ne jê ne’ û dikevin nava wê, diçilvire; ji kan û sedemên xwe yê afirînê dûr dikeve û bi her qonaxê re jî hêmanên wê yê resen tînin tunekirin û windakirin; helbet ne tenê hin hêman tînin windakirin, di heman demê de civakek (û pê re jî takekes) bêbîr û bêdîrok tînin hiştin. Wekî dongîya vê kurte-nirxandina xwe, em dikarin bêjin: Windakirina çandan û pê re jî bêbîrhêlan û bêdîrokhêlana takekes û neteweyan ne bi pêwendîyeke xwezayî ye; bi destkariya hêzekê pêk tê ku “Çand, bi demê re, bi awayekî êrîşkar, bi netewe an jî netewe-dewletê re tê bilêvkirin; û dibe kana zanavê (identity) û ‘em’ê ji ‘ew’ê cihê dike.” (Said, 1998: 4) Tundiya ku E. Said bi gotina ‘êrîşkar’ behs jê dike, kana sereke ya pêkanînen serdestiya mêtînger e. Serdestiya mêtîngeriyê, serweriya nîrxên çandên xwe li civak û komên etnîkî yê bindest ferz dike û pê re jî çanda gelê bindest bîrîx-bêqîmet dike. Ji ber ku çanda gelê bindest jî destkariyeke dîrokî ye li ser xwezayê û bi qonaxên dîrokê re hatiye afirandin û ji ber ku serdest tu serwerî li ser xwe qebûl nakin û “dixwazin çanda xwe di navenda jiyanê de bi cî bikin,” (Fromm, 1981: 48) mêtînger û desthilatên mêtîngerîyê her tim di nav hewldanê de ne ku destkariyê li çanda bindestan bikin. Ev destkariyên ku di her helûmercê de, bêtir bi rêya ziman tînin pêkanîn, derbeke taybet li hiş û bîra mirovên bindest dixin û ji demekê û şûnde jiyar û ezmûnên wan “li bêjînga bîr û hişberiya wan nakevin; û dimînin di qada derhiş de” (Fromm, 1981:

54) û her ku diçe ‘jêdûrbûnek’, ‘hayjênebûnek’ û ‘neçalakiyek’ê ava dîkin bi mirovê bindest yê marastî re û wekî encama vê qonaxê berê takekesên bindest yê marastî, bi alî lixwenebanbûnê ve diçe.

Ji ber ku ziman hêman û hilgireke (carrier) sereke ya çandê ye, mirovê bindest yê marastî, bi gelek navgînên asîmîlasyonê; bi taybetî bi tundiya ku bi ‘kêmnirxkirina neteweyî û nîjadî’ tê meşandin, ji hebûna xwe, ji hêmanên hebûn(iy)a xwe sar dibe, jê dûr dikeve û piştî bihurîna di qonaxekê re, li çand û zimanê xwe neban dibe.

Çavkanî

- Botî, Kamêran (2007) Ferheng, Kurdî-Kurdî, Stenbol: Weşanên Do, çapa yekem.
- Bozarslan, M. Emin (2018) Ferhenga Kurdî, Stenbol: Weşanên Deng, cildê sêyemîn.
- Cassirer, Ernst (1980) İnsan Üstüne Bir Deneme, (Çev. Necla Arat), İstanbul: Remzi Kitabevi, 1. Basım.
- Farqînî, Zana (2004) Ferhenga Kurdî-Tirkî, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem.
- Fromm, Eric (1981) Psikanaliz ve Zen Budizm, (Çev. İlhan Güngören), İstanbul: Onur Basımevi, 1. baskı.
- Gasset, Ortega, Y., (1995) İnsan ve “Herkes”, (Çev. Neyire Gül Işık), İstanbul: Metis Yayınları, 1. Basım.
- Hegel, Georg, W. F., (1986) Tinin Fenomenolojisine İlişkin Temel Düşünceler, (Çev. Nejat Bozkurt), İstanbul: Remzi Kitabevi, birinci basım.
- Kiraz, Sibel (2011) ‘Yabancılaşmanın Kökeni Üstüne’, FLSF (Felsefe ve Sosyal Bilimler Dergisi), Güz, sayı 12.
- Marx, Karl (2007) Yabancılaşma: 1844 El Yazmaları, (Çev. Kenan

Somer, Ahmet Kardam), Ankara: Sol Yayınları.

- Said, Edward (1998) Kültür ve Emperyalizm, (Çev. Necmiye Alpay), İstanbul: Hil Yayınları.

- Schnapper, Dominique (2005) Sosyoloji Düşüncesinin Özünde Öteki ile İlişki, (Çev. Ayşegül Sönmezay), İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.

- Timuçin, Afşar (1992) ‘Yabancılaşma Sorununa Genel Bir Bakış’, Ankara: Felsefe Dünyası Dergisi, Türk Felsefe Derneği Yayını, sayı 5.

- Uygur, Nermi (2001) Kültür Kuramı, İstanbul: YKY Yayınları, birinci basım.

Ferhengoka Têgihî

Berhênan: manufacture, production, üretim

Ciyawaz-cihêwaz: discrete, different, farklı, ayrık

Demajo: proces, süreç

Derbar: regardind, about, dair

Dîke: Other, öteki

Hişber: conscious, bilinçli

Hişberî: consciousness, bilinç

Kirde: subject, özne

Maraştî: exploited, sweated, sömürülen

Nebanbûn: alienation, yabancılaşma

Şêwe: style, form, biçim

Tiştê: object, nesne

Xwebûn(î): entity, self, kendilik

Zanav: identity, kimlik



‘Ferhenga Kurdî’ ya M. Emîn Bozarlanî

■ Roşan Lezgîn

Ferhenga Kurdî ya M. Emîn Bozarslanî safî bi Kurmancî ji çar cildan pêk tê. Her çar cild di ebadê 16×24 de tev 3.760 rûpel in û di navbera salên 2011-2021-ê de ji Weşanên Deng weşiyane. Ev Ferheng di nav ferhengên Kurmancî de berhemeka cihê ye. Çimkî ferhengên din yên Kurmancî ku ez ji wan xeberdar im, ferhengên hevberkirina peyvên Kurmancî û peyvên Tirkî, yan jî peyvên Kurmancî û peyvên Erebi ne; daneran, em bibêjin, pêşî peyvên hazir yên Tirkî rêz kirine û li hemberî peyvên Tirkî peyvên Kurmancî danîne, peyvên ku nedîne jî çêkirine; ev bûye “Ferhenga Tirkî-Kurdî”. Paşê, cihê peyvên guhertine, hingê bûye “Ferhenga Kurdî-Tirkî”. Lê ya rast, ew ferhengên hevberkirina peyvên Tirkî-Kurmancî ne.

Di manaya umûmî de ferheng ew berhem e ku tede bi awayê ku koka peyvê esas bête girtin peyvên zimanekî ji herfa A ber bi Z hatine rêz kirin û yek bi yek mana yan jî manayên wan bi zimanekî bêdem (bêkîp), sade û zelal, bi kurttirîn îfadeyê hatine nivîsîn. Di piranîya ferhengan de, peyva ku behsa wê dibe, li gorî manaya madeyê, di nav cumleyê de bikaranîna wê jî hatiye nîşandan ku rast were fêmkirin.

Amadekirina ferhenga hevberkirina peyvên jî helbet kedeka mezin dixwaze lê amadekirina îzehkirina manaya peyvên bi dehan car zêdetir kedê dixwaze; hakimîyeta li wî zimanî û zanîneka kamil ya zimannasîyê dixwaze. Ji vê çendê, amadekirina ferhenga manaya peyvên karê her kesî nîne. Ji vî alîyê ve, ji ber ku M. Emîn Bozarslanî xwe daye ber karekî wisa, lewre teqdîreka mezin heq dike.

Lê, di vê nivîsa kurt de, ez ê bi çavê krîtîkê li ferhenga wî binêrim û bi kurtî çend tiştan nîşan bidim. Di alfabeya xwe de bikaranîna herfên “I” û “î”yê em bidin alîyekê, M. Emîn, di cilda pêşîn de, li jêr serenavê “Pêşkêşî”yê bi dirêjîya 38 rûpelan nivîsiye lê gelek tişt tîk kirine. Li derekê dibêje “... gundiye Kurdistanê çawa, bî çî awayî dîpeyivîn,

divê ku em wi awayê peyvîna wan jî xwe ra bîkîn bîngehek û pîvekek.”
(r. 9) Çawa ku dixuye, bi zerfa “divê” li ser me ferz dike ku em awayê peyvîna gundîyan jî xwe re bikin bîngeh û pîvan.

Em kurdên Hewramî û Mukrî û Lûr û Zaza bidin alîyekî, bila tenê kurmancên me kurd bin û zaraveyê ku kurmancên me pê dipeyivin Kurdî be. Ev kurmancên me li deh hezaran gundên Kurdiştanê ku di nav sînorên siyasî yên dewletên mîna Tîrkiye, Îraq, Îran, Sûrîye, Ermenîstan û Azerbaycanê de dijîn. Her perçeyek, her herêmek, heta ku her gundekî kurmancên me bi awayekî dipeyive. Bo nimûne, gundîyekî herêma Berferatê û gundîyekî herêma Goyanê bêne ber hev, bi qasî ku jî hev tenegehên Kurmancîya wan jî hev cihê ye. Gelo em divê awayê peyvîna gundîyên kîjan perçeyî, kîjan herêmê, kîjan gundê Kurdiştanê jî xwe re bikin bîngeh yan pîvan? Û gelo li bajarên Kurdiştanê yên mîna Amedîye, Bazîd, Bidlîs, Cizîr, Dihok, Diyarbekir, Hekarya, Licê, Maku, Muks, Qamişlo, Silîvan, Zaxo û hê gelekên din qey Kurmancî nehatiye peyvîn? Gelo kurd tenê jî gundîyan îbaret in?

M. Emîn dibêje “dî zîmanê Kurdî da sê zarên (lehce) sereke hene. Ew her sê zar Kurdiya Bakur, Kurdiya Başur û Zazakî ne. Dî eyî demê da jî Kurdiya Bakur ra ‘Kurmancî’ jî, jî Kurdiya Başur ra ‘Sorani’ jî, jî Zazakî ra ‘Kirdkî’ [Ya rast, Kirdî] jî tê gotin.” (r. 11) M. Emîn qey Hewramî û Lûrî û zaravayên din yên jêra Kurdiştanê jî Kurdî hesab nake? Û dewam dike dibêje “Me dî amadekîrîna vê ferhengê da zarê Kurdiya Bakur da ber xwe û ferheng bî wi zari amade kîr.” (r. 12) Em têdîgehên ku ferhenga wî bi Kurmancî ye, lê diyar nîne ku Kurmancîya kî derê yan ya gundîyên kîjan gundî ye.

Ev pêşniyaz yan jî dîkteya M. Emîn maqûl nîne!

Çi Kurmancî, çi Zazakî yan jî diyalekteka din ya Kurdî be, di zîmanê nivîsînê de, divê em sîstema Kurdî jî xwe re bikin bîngeh û pîvan, ne

ku zimanê gundîyan, yan zimanê bajarîyan, yan jî zimanê filan herê mê. Divê em avanî û sîstema zimanê Kurdî baş nas bikin û di warê nivîskî de rîayetî qeydeyên eslî yên Kurdî bikin. Di zimanê nivîsînê de divê bingeh û pîvan sîstema Kurdî be.

M. Emîn dibêje “me peyvîkên Kurdî jî sê serçaviyan, jî sê jêderan berhev kîrin û di ferhengê da bîci kîrin. Ev her sê serçaviyên giring, ev in: 1-Awayê karanina pîraniya gelê Kurd, 2-Edebiyata Kurdî ya klasîk, 3-Folklorê Kurdî” (r. 9) Ev jî îfadeyekê bêçarçove û muxleq e! Mesela, wî awayê karanina pîraniya gelê Kurd bi kîjan metodî û çawa tesbît kiriye, diyar nîne. Lê dibêje “amanc û daxwazên me ew bû û nuha jî ew e ku, em ferhengê fire û têrnaverok, bi awa û metodên zanyarî binivîsin, amade bikin û bîgihînin destê gelê Kurd.” (r. 41) Lê prensîba “di nivîsînê de ekonomî” di bala wî de nîne. Tiştê ku wek “fire û têrnaverok” îfade dike jî, esas dirêjkirina gotinê ye. Ewçend dirêj dike, ew bi xwe jî bîr dike ku li jor çî gotiye. Wek nimûne, li jêrê wê îfadeya xwe îcar dibêje: “Mesela, kîrara ‘çavronibûn’ê, wek maddeyekê xweser hat nivîsin. Lewra ew kîrara ne pîrr dirêj e û ne xerîb e, li zewqê mirov tê.” Eger peyvîk jî sê serçavîyan bi metoda zanyarî hatine berhev kirin, hingê ew zewqê mirov dibe çî?

M. Emîn dibêje “Dî amadekirina vê ferhengê da yek jî amanc û daxwazên me yên sereke ew bû ku, em maneyên peyvîkan bi awayekî fire û zelal bîdînin zanîn û jî xwendevanan ra pêşkêş bikin. Yani me xwest ku em ferhengê bi awayekî wisa amade bikin ku, xwendevanên Kurd maneyên peyvîkên Kurdî bi zimanê Kurdî û bi awayekî fire û têkuz bîbin û bîxwinin.” (r. 13) Pêşî tiştê îfade dike lê bawer nake ku em ê jê fêhm bikin, îcar dibêje “yani” û eynî tiştî bi awayekî din bo me dirêj-dirêj qiset dike; heta ku jê tê dirêj dike, dîsa û dîsa eynî tiştî dibêje.

Îzehkirina maneyên peyvîkan jî wisa dirêj, tekrar û tekrar e. Lê pîranîya

îzehetên manaya peyvan hem bêçarçove ne, hem jî kê m in. Mesela, îzehkirina manayên “av”ê zêdetirî sê rûpelan cih girtiye. Cumleya pêşîn ya manaya peyva “av”ê wisa ye: “Maddeyeka ron û zelal a vexwarîna giyandaran e; maddeyeka ron û zelal e, bêbêhn û bêreng û bêtam e ku, jî aliyê giyandaran ve tê vexwarî.” Hê di cumleya pêşîn de peyvên “madde”, “ron û zelal”, “vexwarî” û “giyandar” tekrar kirine û eynî tiştî du car îfade dike. Lê çawa ku dixuye, derheqê wesfa avê de melûmat dide, dibêje “maddeyeka ron û zelal e” lêbelê manaya avê îzeh nake. Tavilî derbasî fonksiyona wê dibe, dibêje “vexwarîna giyandaran” e. Ya raşt, di amadekirina ferhengê de tenê manaya peyvan îzeh dibe, ne ku fonksiyona wan. Bo nimûne, av tenê vexwarîna giyandaran nîne, nebat jî avê vedixwin. Ê madem behsa fonksiyona avê dibe, hingê diviyabû behsa hemî fonksiyonên wê bikirana.

Ji vir bi qasî deh sal berê min di “Ferhengê Çekuyanê Mewlidê Kirdî” de madeya “av”ê bi Zazakî wisa nivîsîye:

awe (m): 1. nm mayîya bêreng û bêboye ke hîdrojen û oksîjen ra ameya pê 2. nm çar elementanê bingeşînan (awe, adir, herî, hewa) ra yew 3. nm mayîya ke netîceyê esirnayîşî de çîyan ra vejîyena

Vekirî, sade, kurt. Lê ji M. Emîn re sê rûpelên dirêj qîm nekirine, derbasî rûpela çaran bûye. (Min li jorê got ku ebada rûpelan 16 x 24 cm ye.) M. Emîn di şûna îzeha madeya avê de meqaleya ansîklopedîyê nivîsîye!

Em madeya “ap” ji ferhenga Mehmed Emîn Bozarslan neqil bikin:

“ap [nnx; nb] Bîrayê bavê kesek, lî gora wi kesi; kur yan mêrê ku ew û bavê kesek jî dê û bavek in yan tenê jî bavek in yan jî tenê jî dayîkek in, lî gora wi kesi. Hvm ‘mam’ e. Djm ‘met’ê ye. ‘Ha dî ci da, dî ci da/

D'mala Apê Heci da/ Ramisanek bîde mîn/ dî kuncîkê tari da'. (SG)
 'Bî nivê tîvinga xwe girt û lî qeracê tenîştê hîlkîşîya ser pîya, gotî Heci
 Mihemedo, lo apo, xeman mexwe, xem xîrab in; herçî kuştin e, jî berê
 va para mêra ye/ Berxê nêr, Rebê alemê daye, tîm û daim jî kêrê ra ye'.
 (SC) 'Cîrna mala Apê Keya/ Ên dî nav ban û xaniya/ divê bîkîn şerm û
 heya/ divê îro neçîn cîya'. (Ç) 'Dî şer da xal û xwarza, dî xwarînê da ap
 û bîraza'. (PP)"

Bozarslan wisa dirêj kiriye lê dîsa jî mana kêr nivîsîne. Çimkî
 manaya peyva "ap" tenê "birayê bavê kesî" bûyîn nîne, wekî îhtîram jî
 mezinan re jî tê gotin, ku ev jî dibe manaya duyem. Li gorî manaya ku
 wî daye, îzeheta wî jî kêr e. Mesela, kur yan mêrê ku ew û bavê kesek
 jî dê û havek yan tenê jî havek yan jî tenê jî dayîkek nebe, birayê bavî yê
 şîr yan jî xortê pîrik yan kalîkî be, yan jî jî alîyê pîrik yan kalîkî ve wekî
 ewlad hatibe xwedîkirin jî dibe apê kesî. Madem wisa dirêj îzeh dike,
 divê ev jî bigotana. Ê mînakên folklorîk ku dane jî, hem zêde ne, hem jî
 li manaya ku wî îfade kiriye nakevin. Mesela, ew Apê Hecî ku di stranê
 de û ew Apê Keya ku di mamîkê de derbas dibe, kesên anonîm in, jî bo
 manaya ku wî nivîsîye nabin nimûne; jî bo manaya ku wî nenivîsîye
 dibin mîsal.

Di "Ferhengê Çekuyanê Mealê Kirdî" de ku niha di destê min de ye,
 ez li ser dişixulim, min bi Zazakî madeya "ap" wisa nivîsîye:

ap (n): 1. nm birayê babîyê kesî 2. sf sey nîşanê îhtîramî pîlan ra yeno
 vatiş

Çawa ku dixuye, her du manayên peyva "ap" kurt û zelal, vekirî û
 fesîh îzeh bûne. Yê ku bixwazin manaya peyvên zimanê xwe bizanin,
 îzeheteka wisa kurt û sade jî bo wan bes e.

Em ji Ferhenga Kurdî ya M. Emîn Bozarslan madeyeka din jî nîşan bidin:

bazin [nmx; nb] Xîşrekî zendên jînan e; xîşrek e ku, jîn jîbo xemlê wê dîkîn zendên xwe û zendên xwe pê dixemilînin. Bazin xîşrekî çenberki ye, xelekki ye; mina çemberek, xelekek e; ji zêr yan jî ziv tê çêkirin. “Jî dengê bazinên zenda/ nema aq’lê aqilmenda”. (EH) “Zahir dîkîrîn ku zend û bazin/ êdî nedîman gîlî û gazin” (X) “Lo lo psmamo, lazîm lazîm/ W’ez sê tîştan j’te dîxwazîm/ Guhar, guştîl, ferek bazin”. (SG)

Çawa ku dixuye, hem tam tarîf nekirîye ku “bazin” çî ye, hem jî mana kêr nivîsîne. Lê peyv û îfade li ser hev tîrîrî kirine; dirêj kirîye. Dû re, mînakên ku peyva bazin têde derbas dibe neqîl kirîye.

Di “Ferhengê Çekuyanê Mealê Kirdî” de ku niha di destê min de ye, ez li ser dîxulîm, min bi Zazakî madeya “bazin”ê wisa nivîsîye:

bazin (n): 1. nm helqaya ke zern, sîm yan zî sewbîna maden ra ameya viraştîş û hîna zaf cînî sey xemlî dekenê zendê xwu 2. nm aleto ke maden ra sey helqa ameyo viraştîş û pê sereyê di lûleyan yan zî di çîyan yeno pêrabeştîş 3. nm qevdê destî yan zî qevdê linge

Manayên “bazin”ê ev in, bi zîmanekî bêdem, kurt, sade, fesîh û zelal hatine îfadekirin.

Hasilî kelam, ez dibêjim îzehkirina manayên peyvên ku M. Emînî hildane nav ferhenga xwe, eger li gora metoda ferhengasazîyê bihatana nivîsîn, tenê cildek têrê dîkir. Wê demê, me dê xweştir jê îstîfade bikira.

Ji îfadeya M. Emîn ku dibêje “Di sala 2001’ê da dema me dest bî amadekirina vê ferhengê kîr” (r. 41) dixuye ku derdora bîst salan li ser vê berhemê xebitîye. Lêbelê ferhenga wî jî a wisa ye! Meriv tenê li wan du madeyên ku min neqîl kirin binêre, ku ew jî kurttirîn madeyan bûn, hingê meriv têdigihe ku ferhengeka çawa ye.

***Roşan Lezgîn**

Roşan Lezgîn di sala 1964an da li gundekî Licê hat dinyayê. Tenê çar sal li dibistana xwend, lê paşî tehsîla xwe ji derve heta lîsansê dewam kir û ji beşa ziman û edebîyatê mezûn bû. Ji sala 1996an vir de berdewam dinivîse. Heta niha 19 kitêbên ku wî nivîsîne û 19 jî kitêbên ku wî wergerandine hatine weşandin. Di sala 2009an da li Diyarbekirê malpera internetî www.zazaki.net ava kir. Di sala 2011an da kovara Şewçîla ku safî bi Zazakî diweşe, derxist ku heta hejmara bîştan derketiye. Dîsa, bi alîkarîya çend hevalên xwe yekemîn rojnameya Zazakî Newepel derxist û heta 100 hejmarî dewam kir. Herwisa di sala 2012an da Weşanxaneyê Roşna ava kir. Heta niha jî vê weşanxaneyê 77 kitêb hatine weşandin

Helbestvanê Kurd Simoyê Şemo, (1928 -2000)

■ Mirazê Cemal

Îro roja bûyîna helbestvan û doxtirê kurdî navdar, dengbêjê hub û evînya wêjeya kurdî, ji eşîra êzdîyaye Şerqîya, Simoyê Şemoye. Helbestvan û doxtirê navdar Simoyê Şemo ku îro hebûya temanê wî îdî wê 94 sal bûya. Lê telebextra helbestvan dirêj jîyan nekir, her bi qelema xweye Zêrîn dîroka wêjeya kurdîda ma wek zêndî. Malbeta wana rêke dûr û dirêje dîrokîra derbaz bûye. Ew ji eşîra qehremanê êzdîyayî navdar Dewrêşê Evdîne.

Simoyê Şemo sala 1928-a li Ermenîstanê herêma Armavîrê, gundê Kelegerxê (niha Şênavan) hatîye dinîyayê. Çawa min jorê gotîye, kal û bavên wî ji Eşîra Şerqîya bûn. Dema koçberkirina êla wana ji Kurdistanê berbi Rûsîyayê ne diyard. Berî komkujîya salên 1915-1918-malbeta wan li gundekî herêma Surmeliyêda nave kîjanê Kitîk bûye mane. Lê dema ew bûyarên şer û cenga dest pê dibin, û hêzên Rûsa paşda vedikişin, malbeta wana tevî bi hezaran malbetên êzdîya koçberî wî alîyê çemê Erez dibin û tevî malbetên xwe Ermenîstana îroyînda disêwirin. Hetanî ku ewê gundê Kelegerxêda cîhwar bibûna, ew gelekî zor zehmetê dibin, rû bi rûyî tunebûnê, xelayê û nexweşîyê dibin. Gundê Kelegerxê cîhkî wisa bû, ku ji vêderêva li wî alîyê Erez gundê wanaye berê dihate xuyanê. Wana keser û kovan dikişandin, û li wî alîyê çem dinihêrîn, çewê wana lê bû, ku wê dîsa vegerine gundê xweyî berê û herine ser mal û milkên xwe. Lê telebextra wisa jî bavê Simo Elîra û ne jî Simora li hev nehat, ku qe na carekî herine wî alîyê Erez gundê xweyî kal û bava bivînin.

Malbeta wana nîv koçer bû. Bahara koçên xwe dibirine zozanên Elegezê, hetanî payîza direng vedigerîyane gundê xwe. Payîza û zivîstana dewat dest pê dibûn, rojên şayîr li rex çîrokbêja û nava dewatada derbaz dibûn. Dibîstana gundê wana ya deh sale bû, li kuderê Simo dixwend û şagirtêkî herî pêşketî bûye.

Dû demamkirina dibistana gundê xweyî Şênavanêye dehsalera, li kuderê kurda û ermenîya tevayî jîyan dikirin, lê malbeta wan havîna diçûne zozana. Li zozana ew kerê berxên xwe dispêre hevalê xweyî zarokatîyê Sihîdê Îbo, kîjanî wî wextî tevî wî berxvanî dikir lê pêşerojêda dibe profêsorê bizjîşkîyê, û helbestvanê kurdî navdar. Simoyê Şemo berê xwe dide Yêrêvana paytext li xwendinxwana bzjîşkîyêda tê qebûlkirinê û bi qîmetê herî bilind demam dike, paşî demamkirina xwendinxwanê, ew zankoya Yêrêvanêye doxtirîyêye dewletêda tê qebûlkirinê û sala 1957-a bi xwendina bilind demam dike.

Wezîreta Ermenîstanêye saxlemîyê wî dişîne kundê kurdayî Sabûnçîyêyî mentîqa Talînê çawa doxtir, lê paşê jî wî destguhestî mentîqa Aparanê nexweşxana Elegezêda tê kivşkirinê wek serokê nexweşxwanê, li kîderê weke 10 sala dixebite lê paşê vedigere Yêrêvanê dîsa bi pêşekê xweyî doxtirîyê, hetanî dawîya jîyana xwe kar dike. Helbestvanê navbar, dengbêjê wêjeya kurdîyî hub û evînyê Simoyê Şemo 72 salîya temanê xweda li Yêrêvanê koça xwe anî ber ber dawîyê.

Ew li goriştana êzdîyaye Sardarapatê li kuderê mêrxwasê êzdîya û ermenîya Cangîr Axa sala 1918-a himberî Romê bi qehremanî şer kirîye, hatîye defînkirinê. Lawê wî Rizganê Simo kîjan bi xwe pêşekê xweva doxtir û helbestvane, û zankoya Yêrêvaêye doxtirîyêda lêktore, turba Simoyê Şemo bi kevrê margarît û wêneyê wî ser baş daye çêkirinê.

Apê Simo mirovekî qedirgir û nandar bû. Min gelek cara tevî wî nan xwarîye û wî gelek qedirê min digirt. Dema dihate rêdaksîya RYA TEZE bi laqirdîyên xwe em didane şahkirinê, helbest mera dixwendin. Ew kurdekî ola xwede êzdîbû. Netewperwar û welat parêz bû.

Çîroka jîyana wî gelekî balkêş, dûr û dirêje, kîjanê ez bi kurtayî dinivîsim.

Berhemên helbestvanê navdarî hizkirî yên weşandî û neweşandî gelekî. Ezê hinek berhemên wîye weşandî vê gotara xweda destnîşan bikim.

Pirtûka wîye ‘‘Nûr,, sala 1961, ‘‘Xetên hubê,, 1967, ‘‘Hikyat derheqa balçemakêda,, 1971, ‘‘Ez û Êl,, 1974, ‘‘Gula gêlî,, 1979, ‘‘Dilê bengî,, 1989, û ‘‘Zozan,, sala 2000-î.

Sala 2008-a 80 salîya şayîrva girêdayî, lawê wî doctorê bizjîşkîyê Rizganê Simo berevoka wîye bi nave ‘‘Baxçe payîzê,, da weşandinê, li kuderê helbestên salên dawîya jîyana şayîrda ku hatine nivîsarê têda cîh girtine.

Şimoyê Şemo hela salên xwendkarîyêda helbest nivîsîne. Ezê vê nivîsêda çend helbestên wî raberî we ezîzan bikim.

EM KOÇER BÛN

Em koçer bûn, ez jî berxvan,

Li nav paşla Elegezê,

Û rojên me derbaz dibûn,

Nola ava Elegezê.

Derbaz bûn sal û zeman,

Koçerî çû, bûme xwendkar,

Lê kulîlkêd Elegezê,

Ez bîr tînim hero, hercar.

Îro îdî ez doxtirim,

Ez ewledê Elegezê

Bi eşq û şah dixebitim,

Gundê pala Elegezê.

Çawa min jorê daye kivşê, ku Simoyê Şemo û profêsorê bizjîşkîyê, helbestvanê kurdî navdar Sihîdê Îbo hevalên heve zarokatîyê bûne, û dema sala 1991-î 18-ê meha çilê Sehîd di aliyê neyarada bi trajêgî tê kuştinê, kuştina wî ser Simoyê Şemo tesîreke giran dihêle û wî çaxî ew helbestekê derbarê Sehîdda dinivîse.

HEVALÊ MÎN

Tune şevê neyêyî xewna min,
Heta sibê gazina nekî,
Nola berê tu birê min
Dilê xweyî behr venekî.
Şev dibine sal li min û te,
Dihingirin, kuta nabin,
Hîv sar dibe û qisva me,
Lê gazinê te xilaz nabe.
Zarotîyêda em bal hevbûn,
Lê niha tu xewnêda têtî,
Ax, felekê çima ha kir?-
Her şev, her car minra dibêyî!
Meremê te tev ma nîvî,
Bext tera bû behra şeva,
Bêje çi bikim, kê bikim hîvî,
Xwe bavêjim kîjan ava?..
Ku hêsabî li wê dine,
Ewê dinîya heta-hetê,
Neyêyî vê dinîya zinê,
Herî cîhê xwe nav cinetê.
Tune şevê neyêyî xewna min,
Heta sibê gazina nekî,
Nola berê tu birê min
Dilê xweyî behr venekî.
QÎZA KURDA
Qîzên kurda, hûn emirin,
Hûn xezalên serê çîya,

Kê we hizke,- bê mirine,
Hûne Tevin ser her çîya.
Şîrinaya zimanê we,
Gezo li ber şerm dike,
Zozana ji kilamên we
Bilbil jî xwe şaş dike.
Hûn şîlanê sîngê qaşa,
Tu dest pêra nagîne,
Û ji huba we çevreşa,
Dilê min kul, birîne.
Qîzê kurda, hûn emirin,
Hûn emirin emirda,
Qolanê min nedihat badin,
Lê bi hubê we bada.
Kê we hizke,- bê mirine,
Hûn kanînîne li gelîyê kûr,
Çevê we reş şev bê bine,
Ez xalîfîm li rîya dûr.
Av
Ji avê xweştir,
Ji avê baştir,
Tek ave, heye,
Avê girantir,
Tu cîya tune ye.
Carna bilbile,
Rewş û sorgule,
Divêjin-eve,
Carna jî hure,

Çîyara difire,
 Qetile teve.
 Lê dîsa ave,
 Mera dê-bave,
 Tîne emire.
 Bira av hebe,
 Timê temîzbe,
 Emir namire.
 GULA GÊLÎ
 Gula gêlî,
 Çira silî
 Tu ji min?
 Ez dixwezim,
 Te biçinim,
 Te biçinim,
 Tu qul dikî

Destê min.
 Te, nederê,
 Ez her derê
 Motacim,
 Lê tim birçî,
 Hub ate tî,
 Ez ji gêlî
 Ker diçim.
 Gula nazik,
 Ça tiberk,
 Were neke vê yekê,
 Dil cegerê min
 Xirab bûne,
 Bike melhem
 Belgekê.
 (Çavkani: Çirûsîya Netemirî)

**JI BONA 90 SALÎYA NIVÎSKARÊ
REHMETÎ EMERÎKÊ
SERDAR (1935 - 2018)**

 Emerîkê Serdar

Dema despêka salên şeştî ez hatim Yêrêvanê xwendinê Emerîkê êdî zanîngeha Yêrevanê ya pêdagogiyê, para edeyet û dîrokê xilas kiribû, demeke kurt dibistana gundê Elegezê (kîderê wî xwendina xwe ya navîn jî standibû) û para axaftinê kurdî ya radiyoya Yêrêvanê da xebitî bû, êdî rojnema RIYA TEZE da dixebitî. Ew û remetyê Egîte Xudo odekê da rûdiniştin. Egît serokê para edebyetê bû, Emerîkê para kûltûrayê rêva dibir. Oda wan dergê xwe yê diloan ber min jî vekir. Ew herd ji minra bûn wek birayê mezin.

Efrandarên meye gênc û ahil, di oda wan da li hev dicivyan, ji hev û efrandinên hevra dibûn nas, berhemên xwe yê nû dixwendin, deng-besên nû dihesiyan.. Wan sala hîmê helbestvanya meyê esil û bi hêz dihate danîn. Hevaltî û doştanya min bi helbestvan û nivîskarên meye ahil û gênc ra bawarkî ji oda wan deşt pê kir... Emerîk wê demê kirîtîka (rexnegirya) edebyetê, edebyetzanyê va mijûl bû. Di qîmetkirna helbestê da gelekî berk bû. Fikira wî ra tev jî hesab rûdiniştin.

Min helbestê xwe berê Emerîkê û Egît ra duxwendin. Doştanî, hevaltî û biratya me bawarkî heta 30 salî kişand, heta deştê me ji hev qetya, em hev bela bûn...

Emerîk dixebitî, pirr dixebitî, şev û roj, bi hizkirin, dil û can dixebitî. Emerîk bi ked û xûdana xwe nerdewanê jiyanêra bilind bû. Û gihîşte çi, bi xûdana xwe gihîştê. Ji serokê parê bû katibê cawdar, paşê dewsgiriyê berpirsyar, paşê berpirsyarê RIYA TEZE...

Keda wî hate qîmetkirin, wek rojnenevanekî komarêyî eyan bi hurmetnema sedirtya parlamênta Ermenîstanê hatî xelatkirin, hêjayî navê Rojnemevanê komarêyî emekdar bû. Ew endemekî yekîtya rojnemevan û nivîskarê sovêtê bû.

Keda wî di pêşxistina edebyeta kurdên Sovêtê da mezin e. Di warê pirozayê da ew heta dewya jiyana xwe jî ma yek ji nivîskarê meyî herî berhemdar û hizkirî.

EwÎ rêdaktorê pirtûka min ya helbesta “Tîrênc” kirye.

*

18 yan 19 ê meha Sibatê sala 2010 a bû. 75 salya Emerîkê Serdar bû. Axaftina me herda ya bi têtêfonê qet ji bîra min naçe.

Wê sibê ez rabûm, min hejmara têtêfona mala hogirê xwe Emerîkê Serdar top kir ku salvegera wî pîroz bikim.

Sal wusa zû diçin. Wextekê li rex Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Nado Maxmûdov, Mîroyê Esed û mezinên meye din em gênc bûn. Wan ber çavê me koça xwe bar kirin, çûn. Ew çûn, em man. Ew neghîştin me, lê em gihîştin wan. Emerîkê me jî êdî pêyî 75 a kirîye,- ez difikirîm...

Emerîk li Yêrêvanê, ez li Ewropayê. 1415- sal bûn me hev nedîtû.

Mecalê vê dewrê ecêvin, hejmara têtêfonê top dikî û dikarî xwe bigihînî her qulçê cihanê.

-Siba te bi xêr Emo...

-Ser çavara, Esker,- dengê min carekê ra nas kir,- min dengê te zûda nebihîstibû. Malavayo tu bûyî hîva pij ewra.

-Ez te pîroz dikim!

-Emrê me çû, me tişt ne jî xwe fem kir, ne ji dewranê...

-Em ji hev dûr ketin.

-Em ji hev bela bûn . Kê zane emê hev bivînin yan, na...

-Tunduriştîya te çawane?

-Êşa çava zorê dide min, mal dernayê...Min helbesta te xwend, ez kewgirîm...

Axaftina me pak nehat şandin. Min nikaribû çî fikira minda hebû hogirê xwe ra bigota. Hisret dûrbûnê û bîranîn salan tev lihev bûbûn... Kela wî li wî alî tiji bû, kela min vî alî... Kerayîke dirêj kete navbera me.

Min dixwest hogirê xwe ra dirêj bixivim. Nehate şandin.

...Wusa jî me hev nedît...

*

Ciyê te buhuşt be, Rehma Xwedê li te be, birayê hêja Emerîk. Tera oxir be!

Eskerê Boyîk

20.02.2018

ZARA EIÎ
(ZARA ALÎYÊVNA YUSUPOVA)
(16.12.1934 - 03.02.2022)

■ Hejarê Şamil

Sed heyf îro (03.02.2022) zanyar û kurdologa mezin, profesor, mamosteya zimanê Kurdî Meta Zerê (Zara Alievna Yusupova) koça dawî kir.

Mamosteya mezin hemû jiyana xwe pêşkeşî netewa xwe kir, ji bo pêşxistinê zaniştiya Kurdî û Zimanê Kurdî kedek bêhempa rijand. Li pey xwe ji 70'î zêdetir berhemên zaniştî ya giranbiha hişt.

Mehekê berê ji bo destbixistina materyalan ji arxîvên Sankt-Pêtersbûrgê çûbûm vî bajarî. Telefon kir: «Metê Zerê, dixwazim werim destê te maç kim». Got: «Hejaro, kurê min, piçekî bêkêf im. Zêde xweşik nînim vê gavê. Carekê din, kengê werê, bibe mêvanê min. Lê, çi alîkarî lazim e, bêje, meta te bo te bike». Bi rastî jî, qey bêtî hemû Sant-Pêterbûrgê rakir li ser piya. Akademiya Zaniştî yê re, Enstîtuya Rojhilatzanî yê re telefon vekir, di rojekê de min çendin kesan re da naskirin. Min du-sê rojan de bi saya meta Zerê karê du salan kir. Tûrika tijî kir, ziviriyam Krasnodarê. Di rojên dawî ya jiyana xwe de jî di nav xîzmetê de bû... Meta Zerê bi emelên xwe ve tim û daîm di dilên her Kurdekî de wê jindar bimîne.

Hejarê Şamîl

*

Çend berhemên wê:

-Ferhenga Kurdî-Rûsî (zaravê Soranî) tevî Qanatê Kurdo

-Zaravê zimanê Kurdîyî Silêmanî

-Lêkolîna zaravê Kurdîyî Goranî bi heykelên edebîye sedsalên 1819-

-Lêkolîna zimanê Kurdî bi seretacên edebiyeta nivîsar (ya sedsalên 1819-)

-Zaravê Kurdîyî Hewremanî li ser hîmê heykelekî edebiyeta nivîsar: Dîwana Saîdî

-Têkstên zargotina Kurdîya Başûr

-Lîrika şayîrê Kurdayî sedsala 19-an Mewlavî (zaravê Goranî)

- Mem û Zîn a Ehmedê Xanî heykela çanda cihanê ye

Hejarê

Hejarê Şamîl

Gotara Esgerê Boyîk: ZERA ÛSIV

(Юсупова Зара Алиевна)

Zimanzana Kurd e navdar, doktora zaniyarîya filologiyê, profêsor Zera Elî (Yûsûbovna) sala 1934 a li bajarê Tilbîsê malbeteke kurdên êzdî da ji dayka xwe bûye.

Malbeta wan, salên rev û bezê tevî bi hezara malbetên Êzdî ji herema Wanê, ji zulma Roma Reş, û olperestên fanafîk reviyaye.

Sala 1953 a bi qîmetê here bilind mekteba bajarê Tilbîsê ya N 8 a xilas dike. Welatê Sovêtê da şagirtên ku bi qîmetên here bilind dewî xwendina xwe ya dibistanê tanîn, mêdala zîv yan ya zêr didane wan. Welêt da derê her îdareke xwendina bilind li ber wan vekirî bû. Zerê mêdala zêr diştinê û berê xwe dide ûnîversîteta Lênîngiradê ya Rojhilataniyê û para filologiya Îranî da tê pejirandin.

Ji pey qedandina xwendina bilind ra, sala 1958 a keça zîrek dikeve aspîrantûra înstîrûta Lênîngiradê ya rojhilataniyê (niha Sankt- Pêterbûrg) ya Akadêmiya Rûsiyayêye zaniyariyê, para filologiya Kurdî. Serokê wê, yê zanîyarî bû kurdzanê mezin Qanatê Kurdo. Nijara xebata wê ya zanîyarî lêkolîna ser zaravê kurmanciya jêrîn (sorani) bû.

Ji pey dewî anîna xwendina aspîrantûrayê ra di “Kabînetê Kurdî” ya wê înstîtûtê da wek xebatkara zanîyarî derbasî ser kar dibe.

Hêjayî gotinê ye, ku ev kabînet sala 1959 a bi pêsdanîn û însiyatîva rojhilatzanê dinêeyan Î.A Orbêlî hatiye demezirandin. Paşwextiyê kabînet bû merkezeke Kurdzaniya cihanêye here bi nav û deng, li wur da xebitîn û xebatên xweye giranbiha di warê kurdzanêyê da nivîsîne kurdzanên wusaye eyan wak Q. Kurdo. Î. Sûkêrman, M.Rûdênko, Y. Vasîlyêva, Î. Smîrnova, K. Eyûbî, J. Mûsayêlyan, O.Celîl û yên din...

Zera Êsiv 1965 a doktoriya xweye ewlin diparêze û navê kandîdatiya zaniyariya filologiyê diştine.

Devedevî nîv sedsalî Zera Êsiv li wê merkeza kurdzaniyê da xebitî û temya hêz û zanîne xwe pêşkêşî lêkolîna pîrsgirêkên zimanzaniya kurdî kir. Guhdariya wê hîmlî li ser zaravên kurmanciya jêrîn bû. Zimanzaniya kurdî da eyane ku zaravên kurdî ser du beşan par dibe; beşa bakûr û ya başûr. Di nav beşa bakûr

kurmancî û zazakî ne (dimilî), beşa başûr li ser sê komika tê parevekirin:

1. Soranî, silêmanî, mûkrî
2. Goranî, hewramî, kendûleyî, bacelanî û yên din
3. Kêrmanşahî, sînêyî, gêrûsî, korûnî û yên din.

Zimanzana bi şûret dinivîse: “ Van salên dewî ez gelekî mijûlî lêkolîna goranî û hewremanî bûm. Bi matêriyalên sertacêd edebiyeta kurdiye bi nivîsar, ku li sedsalên XVIII-XIX da hatine efrandin.. Ji wana ne. Dîwana Seîdî (XVIII), dîwana Welî-Dêwane (XVIII), “Sîrin û Xusrow” ya Xanay Qubadî (XVIII), dîwana Mewlewî (XIX), dîwana Cefayî (XIX). Lê gerekê bê goton, ku gavên pêşin ji bo lêgerîna zaravê goranî li aliyê îranîstê bi nav û deng Muhemmed Mokrî va hatibûne kirin, yê ku çend destnivîsarên goranî (piranî bi naveroka dîndariyê) çapkirine”.

Sala 1992 a bi tîma zaravê guranî bi heykelên edebiyeta nivîsar ya sedsalên XVII-XIX, tîza doktrîyê diparêze û navê doktora filologîyê diştine. Tevî monografiya, kurdzana bi nav û deng nêzîkî 80î zêdetir gotar, li ser pîrsgirêkên zimanzanî, edebiyet û folkîlora kurdî weşendiye. Xêncî karê zaniyarî usa jî karê pêtagogîyê va mijûl bûye. Li Ûnîvêrsîtêta Sankt-Pêtêrbûrgê da dersê zimanê kurdî daye. Em navê çed xwebatê wê bînin, ku meydana zimanzaniya kurdî da cîyê xwe yê hêja girtine:

-Ferhenga rurdî-rûsî (zaravê soranî) tevî Qanatê Kurdo.

-Zaravê zimanê kurdîyî silêmanî.

- Lêkolîna zaravê kurdiyî goranî bi heykelên edebîye sedsalên XVIII-XIX. Lêkolînê da li ser hîmê nivîsarên edebiyetêya nivîsar ya wan sedala bi her alyava zaravêkî kurdayî kêma lînhêrandî goranî hatiye lêkolînkirin. -Lêkolîna zimanê kurdî bi seretacên edebiyeta nivîsar (ya sedsalên XVIII-XIX).

-Zaravê kurdîyî hewremanî li ser hîmê heykelekî edebiyeta nivîsar: Dîwana Saîdî.

-Têkstên zargotina kurdîya başûr.

-Lîrika şayîrê kurdayî sedsala XIX Mewlavî (zaravê goranî).

-Mem û zîna Ehmedê Xanî heykela çanda cihanêye.

Zimanek hewbeş bo kurdan

■ Husein Muhammed

(Berî 20 salan ez xort bûm, wek xortan jî xwîngerm û xeyalperîst bûm. Şevêkê min kir û nekir, xew nehat çavên min ji ber ku di xema wê yekê de bûm ku kurd ne xwedî zimanekî hevbeş in.

Heman şevê, berê şefeqê rabûm û min ev rêbaz li ser bingehe kurmancî û soranî danîn.

Ne hingê û ne jî niha li ser wê baweriyê me ku divê kurd dev ji zaravayên xwe berdin. Lê hingê xurt li ser wê baweriyê bûm ku rojekê zimanekî hevpar li ser bingehe zaravayên mezin yên kurdî bêt avakirin.

Van rojan çend kesan nêrînên min derbarê avakirina zimanekî hevbeş yê kurdî pirsîye.

Çêkirina zimanan ne tiştêkî dijwar e. Lê danqebûlkirina wan di dem û derfetên niha de ne mimkin e. Loma hêvî dikim ku em enerjîya xwe bidin kurdiya heyî, ne ti kurdiyên nû li yên heyî zêde bikin.

Lê bi armanca hêsankirina jihevfehmkirinê, li gel qisekerên devok û zaravayên din, mirov dikare hinek tiştan biceribîne. Lê tenê bo hêsankirina fehmkirina ji axiftina hev, ne wek zimanekî “standard”.

Kerem bikin ceribandina min ya berî nêzîkî 20 salan bibînin. Ew ne tenê qeyd û bendên “sormancî” datîne, herwiha wan bi “sormancî” şirove jî dike.)

Zimanek hewbeş bo kurdan

Têbînî

Kurmancî:

Advertisement

Ev pêşniyar bo zimanek hevbeş yê kurdî (ZHK) bi têkilkirina kurmancî (K) û soranî (S) anku sormancî hatiye nivîsîn.

Soranî:

Em pêşniyare bo zimanêkî hawbeş î kurdî (ZHK) be têkellkirdinê kurmancî (K) u soranî (S) wate sormancî nûsrawe.

Pêşbêjî

Le em gutar hewl dedim ke çend pêşniyarek bo zimanek hewbeş î kurdî (ZHK) le ser bingey yeksengîyê kurmançî u soranî pêşkeş bikim.

Armançî min ne ew e ke zimanek hewbeş î yekgirtî bo hemû kurdan danim u bêjim ke hemû kurd dewê em ziman be kar bihêne u destê zarawayê xo berde. Em pêşniyar zêdetir bo pêwendiyani nêw soranî axiwan u kurmançî axiwan e. Belku em pêşniyar bo zimannasan şî sûde hebe lê zortir hewl dedim ke pêşniyarî min arîkar be bo kesani dexwazin fêrî têgeyiştinî zarawayani kurdî bibin û be şeweyek wa bi axiwin ke kesani zarawayani di şî je ewan fam bikin.

Rêbaz

Le pêşniyarî min du rêbazî sereke hen: 1) yeksengîyê (wekhewî) kurmançî u soranî, u 2) asankirinî zimanî kurdî.

Le bijêrînî peyw û şewê bo zimanî hewbeş, tiştî giring ne ew e ke aya peyw yan şewê be kurmançî yan be soranî ye. Giring ew e ke aya ew peyw yan şewê hewbeş, asan û xoş e yan na.

Min hewl dedim ke ZHK be her şewê asan be. Bo ew, le ZHK zayendî nêr u mê (ke le kurmançî heye) niye. Herçend e ke le kurmançî u soranî ergatîvîte heye, le ZHK nabe. Le herdu zarawa du şewê cînaw (pronoun) hen lê le ZHK tena yek şewê debe. Herwa le ZHK nawan (nouns, substantive) wenaçemin (natewin) wextî subje yan obje bin yan le gel prepozîsyonan be kar bihên.

Alfabe

Mirov deşê (dekarin / detiwane) ZHK be herdu alfabey latînî u erebî binûse.

Herfanî ZHK le alfabey latînî eman in: Aa Bb Cc Çç Dd Ee Êê Ff Gg Hh Ii Îî Jj Kk Ll

Mm Nn Oo Pp Rr Ss Şş Tt Uu ûû Ww Xx Yy Zz

Herfî “V”î kurmançî le ZHK hercar debe W.

Ç, K, P u T herdem req in. Wek kurmançî nerm nabin.

Le ZHK “L”î qelewî soranî niye, herdem ziraw e.

Cînaw

Le ZHK tena yek corey cînawan heye.

Kurmancî..... Soranî..... ZHK

ez / min..... min / -im..... min

tu / te..... to / -it..... tu

ew / wî, wê..... ew / -î..... ew

em / me ême / -man..... me

hûn / we..... êwe / -tan..... we

ew / wan ewan / -yan... ewan

Advertisement**Nimûne**

Kurmancî Soranî..... ZHK

Ez dikim / Min kir... Min dekem / Kirdim.... Min dekim / Min kirim

Tu dixwîn / te xwend.. To dexwên / Xwêndit... Tu dexwîn / tu xwendî

Le ZHK pêwîstî be cînaw niye: (min) dekem, (min) kirim, (tu) dekî, (tu) kirî.

Le ZHK cînaw ne wek subje (kirde), ne wek obje (bireser) u ne şî le gel prepozîsyon yan postpozîsyon nagorin:

Min ew nasîm.

Ew min nasî.

Min le gel ew hatim.

Naw (Noun, substantive)

5.1. Zayend

Nêrî u mêyî le ZHK niye. Nimûne:

Kurmancî..... Soranî..... ZHK

keça min..... keçim, keçî min..... keçî min

kurrê min..... kurrim, kurrî min..... kurrî min

jîna wî jînî, jînî ew..... jînî ew

